


# O ROJA NÛ

*kovara huneri çandi û edebi*



27  
1990

## NAVEROK

Lî Kurdistana Tîrkiyê rabûna gel.....	3
Cîmaet û Dirhebandin -Şekroyê Xudo û Nado Mehmûdov....	4
Jî bo biranina 5 saliya Tofiq Wehbi -Newroz.....	8
Jî diroka navê Kurdistanê -Keremê Anqosi.....	10
Jî Zargotîna Me: Şerê xal û xwarziya -Berevkar Newroz.....	12
Pix -Vazgal.....	14
"Riya Berbî Tavê" (Rizaliyê Reşit) - Babayê Keleş.....	15
Belge: Beyannameya Şêx Seidê Piran.....	16
Dayê Amine.....	18
Helbest: Ki Dibêt Miri! -Xelil Dihoki.....	20
Jî Gernama Ewliya Çelebi.....	21
Peyvîn Dûhev/1 - Vazgal.....	25
Tiyatro: "Welatê Min Di Dilê Min Da Ye"/3.....	27
Dengê "DENG" nayê birandin!.....	30
Newroza 1990 û şiyariya netewi.....	31

Lî ser bergê pêşin:  
Didemek jî bajarê Mêrdinê. Sal: 1900

**Sal: 11  
Hejmar: 70, Nisan 1990**

ISSN 0283-5355

**XWEDİ:** KOMKAR-Swêd  
**BERPIRSIYAR:** Şêroyê BOTAN  
**NAVNIŞAN:** Döbelnsgatan 16 B  
113 58 STOCKHOLM  
**TELEFON:** 08/ 328251  
**HESAP NO:** PG. 458980 - 0

**UTGIVARE:** Svensk Kurdiska  
Arbetarföreningen  
**ANSVARIG UTGIVARE:** S. BOTAN  
**ADRESS:** Döbelnsgatan 16 B  
113 58 STOCKHOLM  
**TELEFON:** 08/ 328251  
**PG:** 458980 - 0

# LI KURDISTANA TIRKIYÊ RABÛNA GEL

Dewleta Tirkîyê jî sazbûna Komarê heya iro hebûna gelê Kurd û heqên wi nasnekir. Kurdan, jî sala 1925 heya sala 1938 li Kurdistana Tirkîyê gelek caran seri hildan û winda kîrin. Ev serhîldan hemû bî xwin û agîr hatin pelixandin. Her usa ji dewleta Tirk diroka Kurdan, zîman û çanda wan qedexe kîr, xwest nişana Kurdan bî her awayi winda bike û wan bîheline, jî holê hîline.

Nîha sala 1990 e û xuya dîbe ku hîvi û daxwazên dewleta Tirk pûç derketin. Kurd winda nebûn û neheliyan. Wan dirok, zîman û çanda xwe jî bir nekir. Daxwaza azadi û serbestiyê di dilê Kurdan da venemiri. Wan, gor şertên nû û bî gelek rê û olaxan ber xwe dan, rêz bûn; bir û baweriyên welatparêzi di nav refen gel da sal bî sal fireh bûn, kok û riçal dan. Û iro Kurd li çarkoşeyê Kurdistanê bî awayeki gelî cardin seri hîldidin. Kurdistan dîkele.

Pîşti serhîldana 1938 (Dersim), li Kurdistana Tirkîyê kurd demeki bêdeng man. Lî tevgera gelê Kurd, jî sala 1960 dest pê kîr û sal bî sal bîlind bû. Dewleta Tirk, çend caran êriş bire ser Kurdan da ku pêşî li pêşveçûnê bigre, lê bî ser neket. Pîşti 12 İlona sala 1980 ji, ev deh sal e ku sazûmana faşî li Kurdistanê har û hovitiyek bêperwa bî rîva dîbe. Zulm, teda, lêdan, kuştin, nefikîrin di jiyanâ Kurdan da bû karê rojane. Dijmin xwest bî vi awayi çavê Kurdan bitirsine, hêzên şoresger û welatparêz bîpelixine, jî pirsa Kurdi xîlas be..

Lê planêni dijmîn serneketin. Zordestiya wi di nav gelê Kurd da agîrê serbestiyê geş kîr. Kurd bî hebûna xwe, heqê xwe û zordestiya dijmîn zêtir hisyar bûn, dijmînê xwe çêtir naskîrin. Diji zulma gîran ber xwe dan. Tîrsê revandin, bî hev girtin û rabûn.

Leşkerê Tirk çend roj beri Newrozê disa li hêla Mêrdinê xwin rijand. Xelkê Nisêbinê bîçûk-mezin, mîr, jîn û zaro li miriyê xwe xwedi derketin, bî hezaran insan di kuçe û kolanê bajêr da meşîya û zulma dewleta Tirk pro-

testo kîr, daxwazên azadiyê bîlind kîr. Polêz û leşker ew gulebaran kîrin. Xorteki din şehid bû, gelek jî birindar bûn. Ser vê yekê xelk dîji leşkerê Tirk rabû.

Pîşti Nisêbinê xelkê bajarê Cizirê rabû. Dijmin disa ew gulebaran kîrin û pênc kes şehid bû, gelek jî birindar bûn. Li Nisêbinê û Cizirê bî sedan kes hatin girtin û eza û cefaditîn. Lî gel seri danani. Li Nisêbinê, Cizirê, Idilê, Midyatê, Dêrikê, Mazîdaxê, Qızıltepê û gelek ciyêni din dikan hatin girtin, meşîn çêbûn. Gelê Kurd dîji leşker û polêz bî kevir û ço ber xwe da.

Kelkê Cizirê cardin bî hezaran meşîya û denge xwe bîlind kîr: "Em azadi dîxwazîn! Bîji Kurdistan!"

Berxedana gel fireh bû. Li Siwêrekê, Silvanê jî bajariyan dikanêni xwe girtin û dewleta Tirk protesto kîrin. Li bajarê Diyarbekrê "Platorma Démocratique" -ku jî gelek hêzên welatparêz pêk tê- gazi gel kîr. Ser vê yekê di 30'ê Adarê da li bajêr hemû dikan hatin girtin. Lî dewleta Tirk bî leşker û polêzê xwe bî ser Diyarbekrê da girt. Ber derê mîzgeftan, mekteban û karxanan girt ku gel dernekeve sûkê, kom nebe û nemeşe. Pîşti Diyarbekir, li Batman û Licê ji, xelkê dikanan girt û ketin karwana serhîldanê.

Lê xuyaye gelê Kurd êdi bî şikleki gelî rabûye. Ew "Intifada" Kurdan e ku dest pê kîriye. Ew pêlê pêşin e û pêlê hin mezintir wê bênen.

Bona vê yekê ye ku dewleta Tirk ketiye tîrs û xofeke mezin. Ew bî vê tîrs û xofê, dîbe ku êrişen nû bine ser gel, zulm û zordestiya xwe hin zêtir bike, hin zêtir xwin birijine. Lî ew ji jî derdê wi ra nabe çare. Êdi tu zordesti nikare vi agiri vemirine.

Bo dewleta Tirk tenê çareyek heye, ew ji naskîrina gelê kurd û heqêni wi ye. Jî vê bêtir rî tune. Gelê Kurd jî bindestiyê ra tucar razî nebû û nabe. Daxwaza wi serbesti ye, aşiti ye, pêşveçûn e. Û êdi roja wê hatiye. Ger iro nebe, sibe..

# CIMAET Ú DINHEBANDIN

ŞEKROYÊ XUDO

Doktorê ulmên teriqê, profesor.

NADO MAXMÙDOV

Niviskar, xebatkarê kultur ê emekdar ê Ermenistanê.

Dı nava tarixa merivayiyê da dinhebandin roleke geleki mezin listiye û hêj ji dilize. Dı bin ala din da şerê mezin hatine kırınê, ax hatine zevtkirinê, cimaet hatine qırkırinê, hînek bîlind bûne, ên mayin nîqis (bîndest) bûne, hatine pêpeskirinê, sîfetê wan ê mîletiyê wînda bûye. Dinhebandinê gelek belavbûyi yanê (ango) hevdînyayê evêñ han in: Xaçparêzi (dinê Isa), Yûdaizm (dinê Mûsa), Mihemedi (yani musulmani) û Bûdayî (bî navê Bûda). Dinê mayin ji hene, lê ên gelek belavbûyi ev in. Tişteki eyan e ku, lî tu ciyi din ewqas qedera cimaeta tevi hev nekiriye, ewqas guhastin pêşda neaniye, ewqas hucetên mîletiyê, etnikiyê, politikiyê, erdan, dutiretiya cimaetan pêşda neaniye. Lî Rojhilata Nêzik û Navin trajedi û bedbextike mezin bûye, tevi ku lî ser himê din wekilên cametekê xweyê ziman, erf-edet, literatûreke pir cûre bûne ji, ne ku tenê ji hev dûr ketîne, lê serda ji derketîne miqabili hev û carna xwin hatiye rêtînê.

Dı nava tarix û qedera cimaetên Rojhilata Nêzik û Navin da gava dinê Mihemediyê ango musulmaniyê hate meydanê, guhastinê gelek mezin pêşda hatine, bî taybeti ji pey qurna 7'an. Ekspansiya (hukmê) Ereban ango musulmaniyê, dı nava çend qur-nan da sîfetê vê niveka dînyayê da guhastinê, çawa ji ali din usa ji ji aliyê dewlet û mexlûqetiyê da. Van qeyde û qanûnên teze lî ser hemû cimaetên vê

nivekê hukum kîr. Çawa dı nava wan da bû usa ji dı nav cimaeta Kurdan da. Dı nava vê miqalê da me nêt (niyet) heye ku wan guhastinê dinhebandinê bîdne kifshê, ku dı nava cimaeta Kurdan da pêşdahatîn -ji qurna 7'an girt yanê ji pêşdahatîna dinê Mihemediyê girt heta niha. Ji serkaniyê teriqiyê em pê dihesin, ku beri belavbûna dinê Mihemediyê dı nava Kurdan da himli dinê pûtperestiyê hebûye. Bî wê ra bî tevayı dı nava Kurdan da usa ji Zerdeşti (hebandîna agîr) û xaçparêzi hebûye. Derheqa vê yekê da ulmdarê Ûris ê eyan V. Minorski, ulmdarên Ereb ên qurna 10. Al Tabori, Ibn-al Asir (qurna 13.) û geleken mayin dînîvisin. Mesele, teriqzanê Ereba yê qurna 10. Al Masûdi dı nava xebateke xwe da çawa derheqa cimaetên İrani yê mayin usa ji derheqa Kurdan û dinê wan ê beri Mihemediyê da dînîvise û dide kifshê, weki "...gelek ji wana agîr dihebinin", yanê Zerdeşti ne. Derheqa xaçparêziyê da, dı nava Kurdan da elame-tiyê (agahdariyê) hewaskar dîdîn. Wek ku me got, xebatên V. Minorski, G. Drayvîr, Emin Zekiyê Kurd, Şakîr Xasbak û ên mayin.

Ji qurna 7'an vîrda destbe guhastinê mezin bûn. Mihemed bû pêxemberê Ereban, cimaeta Nivada lî pey wi çû. Lî ser himê prensiba "bratiyê û wekheviyê" Mihemed bû himdarê dinê teze, resûlê (wekilê) Xwedê, cimaet lî dora wi civiya. Dı sala 632'ân da Mihemed wefat kîr û xelife-

tiya Ereban hate sazkırınê. Çar xeli-fen pêşin Ebû Bekir (632 - 634), Omer İbn Xeteb (634 - 644), Osman İbn Effan (644 - 656) û Eli İbn Ebû Taleb (650 - 660) bûn, ku êdi destbî şerê zeftkirina erdên dereke û bî darê zorê destbî belavkirina dinê islamiyê kîrin. Dî salên 637 - 638'an da ordiya Ereba Mezopotamiya Jorin (Kurdistana Iraq a niha) hîlda, paşê ajote ser Karmasinê (Kermanşahê). Teriqzanê Ereba yê qurna 9. Al Balazûri dînivise, weki ordiya Ereba "temamiya kelayên Kurdan hîlda destê xwe." Şereki giran hate kîrinê bona Şehrîzûrê. İbn Al Yakût dînivise, weki ew "qesayeke mezin e, orta Erbilê û Hemedanê ye... Bîneçihêne vê nehiyê gîşk Kurd in." Lî teriqzanê Ereba Ebû Dûlaf (qurna 10.) dînivise, weki cîmaeta Şehrîzûreye Kurd teslimi dijmin nedibû û berk şer dîkîr. Serkanîyêni wi çaxê yê terîqi nişan dîdîn, ku cîmaeta Kurdan şereki giran û berk kîriye miqabili Ereban, ku dinê wana bî destê zorê dî nava Kurdan da dîda belavkirinê. Em guhdariya At Tabori bîkîn: Ew dînivise, weki dî sala 643'an da lî Birozê (Kurdistana İranê) "Kurdên pûtperest şereki berk kîrin û dinê islamiyê hilnedan, usa ji cizya û xerc (bac) nedane Ereban. Pey wê yekê ra Ereban, ew qîr kîrin û dil hildan." Ew Kurdên ku dinê Mihemediyê hilnedîdan divê dî dewsa wê da xerc (bac) bîdana, ku jê ra dîgotin cizya. Cizya û xercêne xweliyê (erdê) bareki giran bûn li ser stûyê Kurdan û ewana mecbûr dîkîrin bona qebûlkirina dinê Musulmaniyê.

Proşesa belavbûna dinê Mihemediyê dî nava Kurdan da geleki dîrêj kuşan-diye. Derheqa vê yekê da ew izbatî dîdîne kîşê, ku zeftkirina erdê Kurdan jî aliyê Ereban va, dî qurna 7'an da dest pê kir û hema wi çaxi her teherî dinê teze lî stûyê Kurdan dîalandîn, lê çawa ku eyan e tenê 200-300 sali şûnda bî destê zorê û şûr ew lî nava pareke Kurdan belav bû. Lî vê derê lazime ku bê gotinê, weki jî bo belavbûna dinê Mihemediyê dî nava Kurdan da, qebilêne Kurdan û gire-

gîren mayin roleke ne kêm listin. Dagîrkerên Ereba (paşwextiyê ên Selçûkiya, Mongola, Tîrka) jî wan ra ziman ditin, mecalêne diwanê, hukum û hebûn dane wana û ewana dinê Mihemediyê qebûlkirin û jî bona belavbûna wi dî nava cîmaeta Kurd ên sade da riya fire vebû.

Xên jî vê yekê, çawa dagîrkerên Ereba, usa ji peyhâtiyêne wan û ruhaniyêne wan ên musulmaniye ulmeki tam sazkırin, ku bî qedreke mezin ali cîmaeta hukumdar dîkîr, weki ew hukmê xwe lî ser cîmaetên bindest bîdomine, sifetê wan ê mîletiyê winda ke. Anegori qanûnên şerîtetê (temamîya qanûndariya Mihemediyê) "hemû cîmaetên Mihemediyê birayê hev in û wek hev in, ew gîşk parçen ometeki ne (mîleteki ne).

Dêmek, bona sifetê vê yan wê cîmaetê bîdne kîşê goti ne ku mîletê wê (etnosa wê) hîldîne ser hesêb, lê dinê wê. Eva fikra, bî himê ideolojiya xwe va qelp e û nîta (niyeta) wê, bîçûkxîstîna extiyariyê (hebûnen) cîmaetên bindest e, windakîrîna sifet û femdariya wan ê mîletiyê ye. Dexesi û qelpiya "wekhevi û biratiya hemû musulmanan", hema jî wê yekê tê kîşê weki dî wexta xelîfetiya Ereban û dî nava wê "wekheviyê"da cîmaeta serdest û hukumdar Ereba bûn, paşê Selçûqi, Mongol, Türk û Farîs. Dî nava temamîya van hukumdariyan da, dewlet û imparatoriyyan da emîret û hukumetên Kurda yênci bîçûk ci-cîyan hebûne (emireta Merwaniya, Şedadiya, Ardalana, Bedîrxana, Soraña û ên mayin), lê bî temamî cîmaeta Kurdan (ku bindest bûn) û Ereban, Tîrkan, Farîzan (ku serdest û hukumdar bûn) bû mecaleke windakîrîna femdariya xwehesina mîletiyê û pêşdaçûyîna cîmaeta me, gelek egle kîr (ewîqand). Bî vê femdariyê şûr û qeweta Kurdan gelek caran hatîye xebatê (bî karanîn) bona karê wan dewletan, ku sîbetîrê her cîrbandîneke Kurdan bona serbestiya mîletiyê, dî nava xwinê da dixeniqandin. Dî qurna 10-11'an da, dî nava Kurdan da êdi dinê Mihemediyê

belav bû. Lê Kurdên ku li ser dinê beri Mîhemediyyê (êzditîyê yanê Zerdeştiyê) mabûn, hêj gelek hebûn. Wekileki mala torînên Kurda, teriqzanê Kurda yê destpêka qurna 19'an Rossem Xan Dumbulli, elametiyen (agahdariyên) geleki hewaskar tine derheqa vê yekê da, weki pêşiyê wi hêj ji ne Mîhemedi bûne... Dêmek, li Kurdistanâ Iranê, li ciheke kifş û berbiçav ji hêj pareke cîmaetê dî berxwe dîda û li ser dinê xwe yê berê sekînibûn. Lê pêlên politikayê û din ewqas bî zor û qewet bûn, ku mala Dumbuliya yê zor ji nikaribû deyax bikira, biketa "navnişa kafîra" û ewê dinê islami hîlda.

Bî vi teheri dinê Mîhemediyyê (islamê) ji qurna 7'an dest pê kir û belav bû, goveka (bingeha) wi fireh bû û cîmaeta Kurda, ku wi çaxi ne wê yê yekbûyi hebû ne ji dinhebandina dî derecke bilind da teşkilkiri, bû xurê vê ideolojiya politiki yê hebandinê yê teze. Dinê Mîhemediyyê guhastinê mezîn kire nava jiyana cîmaetê. Usa hat stendinê, ku ji aliyê hebandinê da dutireti (dubendi, nakoki) kete nava cîmaeta Kurdan. Cîmaetê himê dinê Mîhemediyyê hîlda, pareke wê yê biçûk ma li ser dinê berê, li ser dinê êzditîyê. Gili bî vê yekê xîlas nabe. Dî nava Kurdên Mîhemedi da ji, ji aliyê din va ferqi heye. Piraniya kurdên Mîhemedi, suni ne. "Sunna", xebereke Erebi ye, ku dîde kifşê: rî, mesela nişandayinê, riya rast. Anegori fîkrîn sunizmê, rabûn û rûnıştandina Mîhemed pêxember, kirinê wi, gili û gotinê wi serkaniya qeyde û qanûnê jiyana mexlûqetiyê û şirovekirina quranê tên hesabkirin. Tereftarên sunizmê, xwe wek ahl-as sunna (merivênn Sunnayê) hesab dîkin û li ser wê fîkrê ne, ku gendi ew in, ku temini û xwestinê pêxember xwey dîkin (dîparêzin). Pareke Kurdan, li Kurdistanâ Iranê Şii ne. Şii (şîizm), ji xebera Ereban a "şaa" peyda bûye, ku firqbûn, dûrketina merivênn ku dicin dîgihijin hînekên mayin dîde kifşê. Şîizm, navê wan dinhebandinên islamê ne, ku dîbêje: "Tenê

Eli İbn Ebû Taleb û zuriyeta wi dîkarin bibin peyhati û şuxulkêşê Mîhemed pêxember. Dî nava şervaniya diwanê da, dî destpêk û nivê qurna 7'an da tereftarên Eli bûne yek û êlankirin, weki tenê izna Eli heye bîbe serokê cîmaetê (dewleta islamîyê). Dî nava şii û suniyan da firqiya himi ew e, ku her yek ji wana bî cûrê xwe (li gor xwe) femdariya imametiyê şirovedike.

Pareke ji dinê "Eli İlahi"ne. (Eli İlahi, ji xebera Farizi ye, ku dîde kifşê Eli Xwedê ye). Peyhatiyêni dîni ji xwe ra dîbêjin, Eli-heq (merivê rasîtiyê). Eva baskeki şîizmê ye, ku dî qurna 15'an da pêşda hatiye. Anegori femdariya wana, Ellah û Eli ji hevdu nayêne cudakirinê. Eli dî nava pêxemberan da, imaman da û merivêni ziyareti da ye. Bî fikra wan roj wê bê, Ellah û Eli wê disa dî dîlqê imamê "sori" Mîhemedi da bêne ser dinê.

Fîrqiya dinhebandinê bî xwe ne tişteki ewqas ecêbmayinê ye. Hilbet bedbextiya geleki mezîn e, weki cîmaetete xweyê zimaneki, teriqeki, erf-edetê tomeri, kilam û reqsê yekanni bî sûr û çepera dinhebandinê ji hev firq bû. Lê serkaniya cîmaetê ye tomeri, kultura wê yê qurn û zemana, literatûra wê ye, ku yeki mina Ahmedê Xani daye, cîmaet xweykiriye, femdariya yekitiyê aniye gîhandiye roja iroyin ê şerê mezîn, ku bî serê pêşmerge tê kirinê. Kes bawer nedîkir, ku firqiya din, sûr û çeperen wi ewqas dutireti bîke nava cîmaeta Kurdan, eger ew ne bindest bûya. Bona neyarêne me, neyarê heri mezîn yekitiya cîmaetê bûye. A lema ji dagîrkeren Kurdistanê, bî taybeti ji Roma reş firqiya din bî her teheri dîda xebitandinê. Bona Surman beri Ezidiya de, Şii beri Suniya de, Suni beri Eli İlahi de. Jî telebext ra ew iro nîkarin bêjin, weki ev yek ji neyarê cîmaeta Kurdan ra li hev nehatiye. Lê bextewari ye, ku ew roj gişk êdi derbaz bûye. Rîknê cîmaeta Kurdan ê tomeri û yek, emek û xebata mezînen milete usa, ku Feqiyê Teyran û Ahmedê Xani, Piremêrd û Cigerxwin, Qazi

Mihemed û Barzani firqiya din dane aliki, dersa yekitiyê yê mezin dane cîmaeta Kurdan û rastî û aqilmen-diya mesela cîmaeta me dane izbatkîrînê, ku şahadetiya mezînayı, kûr-dûrditina cîmaetê dîde: "Şûrê mîlet bî fêza şûrê din va girêdayî ye". Xwesî xeber in. Meriv pêwisti nabine ku wana şiroveke.

Nîha em dî wedê (dema) eşkeretiyê da dijin û ev kerema mezin ali me dîke, şuxulê me hêsa dîke ku caba çend pîrsan bîdîn, ku hêj têne meydanê. Dî axîriyê da me dixwest guhda-riya xwendevanê xwe bîda ser çend izbatiyên han. Ne ku tenê Kurd, lê usa ji gelek cîmaet hene, ku pareke wana dineki dîhebine, pareke dinê ji dineki mayin. Awa mesele: Hene Erebê mu-sulman, hene Erebêna xacparêz, Gûrc himli (ji bîni) xacparêz in, lê pareke wan, ku jê ra dibêjin Acar, dinê Sur-maniyê dîhebinin. Lê ev cîmaeteke xweyê zîmaneki ye, teriqeki ye. Yekitiya Kurdêñ êzdi û Kurdêñ musulman çawa cîmaetek bî izbatiyên giha he-waskar va tê meydanê. Şadetiya mîleti yê here zor, zîman e, zîman yek e, gelek erf-edet yek in (firqiyan erf-edetên Kurdêñ êzdi û Kurdêñ musulman, dî axîriyê da giha, dî nava demê da zef pêşda hatine), kîlam û reqsêne me yek in, niviskarê me yek in. Tişteki geleki layiqi biranînê ye, weki gelek qebilêne me hene (heta roja iroyin ji), weki pareke wan dinê mu-sulmaniye hildaye, pareke dinê li ser dinê berê, bzditiyê maye. Vê gavê qeb-ilêne Şemsîka, Rojka, Sipka, Hesenîya û geleken mayin ne tenê dî nava êzi-diyan da hene, lê usa ji dî nava Kur-dêñ musulman da. Dêmek, ev izbatiya han şikê nahêle bona wê yekê, weki cîmaetek e lê din cuda ye!

Dî welatê me da, welatê pêşdaçûyi da pîrsa dinhebandinê şuxlê wijdanê her meriveki ye. Lî cem me izna her meriveki heye ku dinê xwe bihebine, ew extiyari li konstitusiyayê hatiye dayinê. Bî wê ra tevayi her merivek, ku haj ji teriq û zemanê derbazbûyi heye, zane (û deyndar e ku bizane) weki pîrsen dinhebandinê û mîlet û

cîmaetê têne daninê û şirovekirnê li ser himê ulmê rast û objektiv. Dinhe-bandin cîmaetê, zîman çê nahe, cîmaet e weki bî şîklîn cure cure, dî nav wê da usa ji bî destê zorê, dinhe-bandinê hildide, yan ji hilnade. Ü eger berê dî rûyê dereca zanebûna nîzim da, dinhebandinê cîmaet bî xwe perde dikir û firqi dikire navberê (suni, şii, êzdi, Eli İlahi), iro her meriveki femdar deyndar e ku qedrê hebândina merivê dorberê xwe bigre, lê bî wê ra bî tevayi deyndar e ku bî bir bine û bîde şirovekirnê, weki stûnên cîmaet, mîlet li ser zîman, li-teratur, teriqâ qedimi, axa tomeri, tomeriti û yekitiya fikir û erf-edetan, dur-cewahirê zargotina cîmaetê û ge-lek tiştên mayin qimetên usa gîrân-bîha nin ku ew nikarin neynine ser hesêb. Meriv geleki li ber xwe dîkeve, weki dî van pîrsan da car cara merivnê usa fikra xwe dibêjin, ku ser ra ber ra haj ji giliyan hene û guloka vê "problemê" giha li hev dîpiçkinin.

Em bî ser hev da binin. Cîmaeta Kur-dan ji rîyeke çetin û dîrêj derbaz bûye. Cîmaeta bêdewlet, bindest, dinê Mihemediyê, ku ruhê mîletiyê dîda kêmkirinê, tunebûna mektebêne bî zîmanê dê... İdi çi lazım bû, weki ev cîmaet winda bibûya, bê ser û berat bîheliya dî nav derdorêne xwe da? Lî ji bextê me ra ev yek nebû! Bersiva vê pîrsê ne ewqas hêsa ye. Ne axîr gelek cîmaetên mayin winda bûn û çûn... Ü iro cîmaeta Kurda yê 20 milyoni, li Kurdistanê dewa extiyariya xwe yê mîletiyê dîke, ew şerkari ji aliyê temamiya dînyayê da hatiye naskirinê. Axiri ya wê ye.

Her tenê pareke cîmaeta Kurda bî saya Şoreşa Oktobrê, bî saya politika partiya Lénin a mîletiyê, dî welatê Sovyetê da azadi û serbesti ani û bî hukumdarîya cîmaetên Sovyetê yêna bîra, dî mala cîmaeta yekiti da kultu-ra xwe yê mîletiyê pêşda dibe.

*Latinîya vê nîvisara jorîn ji ali Marina EZIZ, ji tipêñ kirili û ji rojnama "Riya Teze" hatiye transkriptiekirin.*



Tofiq WEHBİ

Dı roja 5.2.1985 da, 5 sal beri niha dı vê rojê da mameste Tofiq WEHBİ, dı bin êrişa giran û çetin a nexweşyeke bêbext da, li nexweşxana Miolsiksê, li bajarê Londra, li paytextê Ingilistanê di 93 saliya emrê xwe da çû ser dilovaniya xwe.

5 sal beri niha Mamoste ji nav refêن xebatkarên gel û welati, ji nav edib, zana û ronakbirên şervanê gel ji aliyê nexweşya bêbext hate telifandin û dilê wi yê tiji ji hêvi û xweziyên bi dest ve nehati, ji saxil ket û çavên wi yên hûrbîn û dûrbîn ji ditinê ketin; bo hemû gava malavayı ji jin, ji heval û hogiran, ji dost û nasiyanan kır û li müşexti û mihacîriyê çû nav diwanxana edib, zana û pisporêن nemir ên gelê me Heriri, Teyran, Ciziri, Xani, Şerefxan û Spartakusên me seydayê Cigerxwin û Y.Guney. Lê qebra wi hêlina bazên bilindfirêن Kurdistanê bû. Ewi zozan, mij û dûman, refêن ewr û agir û cihê brûska hilbijart dada li ser çiyayê mezin ê Piremegirûn. Mamoste berya mirina xwe, li ser doşeka germ û biyani li müşextiyê wesiyet kır û got: "Eger mirim min bibin li ser çiyayê mezin ê Piremegirûnê veşérin. Çunku ew, çiyayê sembola xweragiri û berxwedana Kurd û Kurdistanê ye."

Piştî xebera pirkovan û giran a mirina mamosteyê hêja, li dervayı welat ji ali welatperwerên kurd termê mamosteyê dilovan danin ser destê xwe li gora weşiyeta wi nemiri, anine nav meydana mirin û şinê, ew cihê ku jê ra dibêjin Kurdistan. Hemû welatparêz ji ber vi xeberi dîl êşîya bûn, pirkovan bûn. Lê çiyayê Piremegirûn, her nedîzani baytê anbaran, serê xwe hildabû nav zikê esmanê şin û bêbini. Ew li hember firokên mîrinbar, top û xunparêن agîrbar xwe ragirtiye, heta ji çekên pîrjhîri ji. Neşîya Piremegirûn çok da bîne û piştebicemine, ew gelek pir e, her ji navê wi ji eyan e. Hindê ku gelê me û welatê me hebûye, ew ji hebûye. Bêguman heta em hebîn her wîsa ew ê ji hebe. Lema mamoste xwestiye li wir çeper bigire, li wir temasîyi bajarê xwe bike, temasîyi Hiroşimaya me bike. Saleke piştî veşartına termê mamoste, firokên wan (firokên dijmîn) diji gelîyan hemû roj û heftiya sê sê, çar çar dihatine ser çiyayê serbilind ê Piremegirûn, hêlinê baz û şahînêñ welat agîrbaran dikirin. Lê ema ji ber çekên bervan û parêzkarêñ welatê Piremegirûn, ji ber

# Jî bo biranina 5 saliya TOFIQ WEHBİ

NEWROZ

pêşmerge û merivêñ Kurdistanê, bîlind dîfîrin, tang, bomb, napalm û roket bî ser wan da dîbarindin. Bawer bikin her ev roj, ne êrişa firoke û tank, top û xunparêñ neyarêñ har û hov, ne ji ba, bager û befîr û seqe-ma zivistana; ne çeka jinkuj a neyarê mamosteyê hêja ji xewê vehejand û hisyar kîr, ne ji pişta Piremegirûn çemand. Mamoste, her weki li li hespeki sêsim, sîpi, kîhîl û beza siwar bûbû û li nav cergê welat tevi den-gê çekan, pêşmergeyan, kilam û lawijan bûbû. Bapirê me, hespê xwe rakîriye çargaviyê û ji nav meydanê dernakeve.

## KURTEJİNA MAMOSTE

Tofiq Wehbî, di sala 1891 da li nav bajarê Suleymâniyê, li Kurdistanâ Başûr çavêñ wi bîşkuvin û dest bi jina xwe kîr. Mamoste, piştî xîlaskırına xwendegheha debiristanê, ji ber dirêjahiya xwendina xwe da rê çû bajarê Bexdayê. Li wir ji qederê 9 sala xwendina xwendegheha eskeri kîr. Çend sala piştî xîlaskırına vê meşqa xwe bû qumandareki bî nav û deng ê hêzên (wek serbaz an ji súbay) Osmaniya. Di nav salêñ 1911 heta 1913 da di şerê Balkan da pişkdari kîr, pey ra bû pişkarê şerê cihanê ji.

Piştî xîlasbûna şer, di nav dewleta Iraqê da, di nav karêñ cûrbecûr da cihê xwe girt û gelek perpirsiyari spartin wi. Di nav salêñ 1920 heta 1929'an li zanineha eskeri mamosteti kîr. Piştî vê bû waliyê bajarê Suleymaniye. Lê ji ber ku guhê xwe neda siyaseta çepel a Ingilistanê û bervani û piştgiri li serhildana xelkê bajarê Suleymaniye kîr, welatparêziya xwe da eyankirin, wi ji kar dûrxistin. Ew qumandareki yekane bû di nav serbâzen Osmaniyan da, ku piştevaniya xwe li serhildana Şêx Mehmûdê nemir kîr.

Mamoste heyameke (demeki) çû Şamê, Beyrûtê û li dervayı welat û paşê disa vege riya welat. Mamoste di sala 1944 heta 1950 çend caran bû wezirê kar û bar ê abori û zanyariya welati, piştre bû nûnerê parlamento ya Iraqê. Mamoste, ji sala 1958'an heta ku çû ser dilovaniya xwe neziviri welat.

Jî destçûn û mirina mamoste, sitêrkek geş ji esmanê edeb, çand û zanayêñ Kurd û Kurdistanê rîjiya. Gelê

me ewladeki ronakbir, zana, şerker û welatparêz ji dest da. Mamoste dî meydana zîmanzani, edebi, geşkirin û pêşvebirina çanda gelê me da gelek cehd, renc û zehmet kışandiye. Dî wi rexî da gelek mijûli ve kolinê li ser bingeha zanîsti kiriye û pir berhem û destkev ji gelê xwe ra afirandiye. Ew bî gelek edeb û çâñd ên mîletên dîn nasiyar bû. Wi jî bîli zîmanê zîkmaki yê xwe, zîmanê Tırkı, Farisi, Erebi, Fransizi, Ingilizi û Elmani dizanibû. Mamoste gelek kurtenîvis û gotar li ser meselêni diroki, felsefi, çandi û siyasi tamar kiriye, gelek nîvisen wi dî nav rûpelên kovarêن Gelawêj, Dengêki Taze û Somer da belav bûne. Mamoste ji aliyê hunerê şervaniyê da ji, pisporkei baş û qumandareki berkevti bû.

Çend berhemên bî nav û deng ên Mamoste, bî van navan in:

- 1- Destûri Zîmanê Kurdi - Kurdi, bî zaravê sorani.
- 2- Xwendewari Baw - Kurdi, bî zaravê sorani û bî ti-pen latini.
- 3- Behram Gur - Bî zîmanê Erebi.
- 4- Qamûsa Kurdi - Bî zîmanê Erebi.
- 5- Quwaêdi êlkeyi Kurdiye - Du cild, bî zîmanê Erebi.
- 6- Lékolineweyi Kurdekan (Kurdish Studies) - Bî zîmanê Ingilizi.
- 7- Yézidiyekan Şeytanperest ninin (The Yazidis are not devil-worshippers) - Bî Ingilizi.
- 8- A Kurdish English Dictionary - Bî zîmanê Ingilizi û Kurdi (Bî servekîrê Roja Nû).
- 9-The Origins Of the Kurd And Their Language - Bî Ingilizi (R.N)
- 10- The Rock-sculptures in Gunduk Cave - Bî Ingilizi (R.N)

Herweha gelek nîvisen mamoste hene ku hêj ne-ketîne bin çapê.

\*\*\*

## BO TOFIQ WEHBI

Piremegrûni gerdenkeş, dosti derûni (gerdeke) û  
Nişaneyi serberzi welat  
Wa mamostayi ziman û mêtû, be kol û bari xemewe  
Bo yekcari hatewe lat

Ewa Tofiqi pir Wehbi koç û bari pêçayewe û  
berew niştiman kewte ré  
Desa Tofiq (piremerd), rîgayı xêli pê nişande û  
bigeyêne hewarê nwê

Korêk bestin be yadi kon, legel Emin Zeki Begi  
Xawêni mêtûyî Kurdistan.  
Çiqlê çawi dujmînan, şaxekeyi Piremegrûn û  
mameyare û gerdeni seyan

Ba weçey em serdemeyi Kurd, gwêyi le dengi hersêktan bê,  
Daxi ser dilê dujmîne  
Destûri ziman, şîr û mêtû, sê çepke guli geşawey  
Berhemî eweyi mezine

Ho welatê neweyi Kawe, ewa roleyi cigergoşey  
Düre wulat û aware  
Gerayewe bigre bawêş, beynêke êccgar bênaz û  
Dilşika û xefetbare

Zor peroşi ateşkedey hezar saleý naw derbend û  
Eşkewit û laqedpalit bû  
Sew û rojê wêrdi demî bûyi, şeydayi dimeni dîlgiri  
Lütkeyi berzi xal xalit bû.

Tinûyi awi sardi kani û befirawi tavge û qelbezeyi  
Çiya û doli kwêstanit bû  
Awatexwazi çilure, û zerdeyi hetaw ser befir û  
Şûşeyi seholbenidanit bû

Car car ke dili pir debû, basî beserhati Kurd û  
Mêtûyi koni yek yek dejmard  
Be qed gelayi dareben û berû û mazûyi daristanit  
Xem le dîlya çoshi dexward

Bangi dekird "ho hezar merd", kwa hezar merdi caranit?  
Kwa şoreswari Babanit?  
Kwa tepîl ala û debdebeyi rojani Xan Ahmedî Xanit?  
Kwanî Baba Erdelanit?

Emane girêyi serdili bû., xefeti şew û rojî bû,  
Heta mabû le jîyana.  
Belam ke basî xebati law û rewşenbiryan dekerd  
Şamerg debû le xoşiyana.

Ho piri muxani dewri ateşkedeyi xêli Zerdeş  
Be sozi gateyi Awêsta  
Xot asayı, wek dîsozêk, korêk germ û gur sazke  
Bo şin û pirseyi mamosta

Kake şîwani şemşal jeni rane meri gundi (Zêwe)yi  
Molxwardûyi nêzik goristan  
Qurbani pence û lêwit bim, deyîsa awazeki be soz  
Le ciyati telqin û quran

Dexiltim mimkeyi naw reşmal, be kaseyi doyi xest û xolit  
Coşî dili damîrênewe  
Be bayî feqiyane û çarocket, tem û miji herdu çawi  
Ramale û birewênewe

Kijoleyi belekan be şan, be dast û penceyi şemşalit,  
Çepîkek guli razawî û cuwan.  
Le ser xo gul bijêrêke, le mergi swêsnê û helaleyi  
Bon xoşî diwi mîrgepan

Bike be eykilîli gori, li giyane laş da hemîse,  
Nawi toyî li ser zuban bû  
Be dem û wirêneyî mergewe, yadi boni helalan û  
Naz û çîrîkeyi çawkalan bû

Ho kewi xal û milnexşin, dekfidayi per û balit bim  
Bifire bo taşî ser lutke  
Qaspet bê, bangeke mamostayi ziman û mêtû gerayewe,  
Bo Kurdistan carêki ke


Bli ew rojey rûnaki tariki şew rade mali û  
Wulat roşin debêtewê  
Ewsa çiroyi piredari newed û sê saleyi (Wehbi)  
Ser le nwê degeşêtewê

Ho law û roşinbiri Kurd, herçen dûrim le Kurdistan  
Belam be dil le geltanîm  
Zor xefetbarim ne mitwani, şanêk binême jêr termi  
Mamostayi mêtû û zibanîm

Berhemî salehay sali dest û pence û bir û hoşim  
Rizyan ken le mozxane  
Hemû deri nûsinêki, genc û samani welate û  
Ceyî şanazi Kurdistanîm

HAWAR

# Jİ DİROKA NAVÊ KURDISTANÊ



Kurdistan, welatê Kurdan e; ax  
û xweliya Kurdan e; dayika miletê  
Kurdan e; kuçikê din û ola Kur-  
dan e; serbilindi û jirbûna Kurdan  
e; kubari û firnaqya Kurdan e; ji-  
yan û emrê Kurdan e. Kurdistan  
Hebûna Kurdan e.

Bêjeya "Kurdistan", jî gîliyên Kurdi bî hev va hatiye danin. Yek: "Kurd", ku navê mileteki Ari ye. Ew beri islamê, yek jî çar perçê miletê Îrani bû: Kurd, Farîs, Cil û Deylam û jî kevnare da dî sinorê Ereb, Farîs, Acûr, Elam, Ermen da, yanê (ango) dî dora çiyayê - Zagros da hatiye xuyakırın. Kurd iro ji dî wan ciyan da perçê perçê dî bin destê Ereba, Tîrka, Farisa da dîji. Keriyê bêjeya "Kurdistanê" yê mayin: "stan" e, ku dî dewsa ci bî me dîde zanin. Wek Kurdistan, Ermenistan, Gürçistan, Tîrkistan, Erebistan, Pakistan, Hindistan, Afganistan û yê mayin.

Kurdistan, navê cografyaya Kur-

dan e, ku jí kevnare da tê da dijí  
jú lê riidiné.

Bî qasi ku em jî dirokê dizanîn, bêjeya Kurdistanê jî sedsala 12'an vîrda tê bî kar anînê. Yek jî nîvîskarê heri kevn ku behsa Kurdistanê dîke, Mustawsi ye. Ew dînivise: "Di dewra niveka Sedsa-la 6'an a hicri da, Sultan Sencerê Şelcûrê (Salên 1096 - 1157) mintîqa Cibal jî Kîrmancanê (Kermansahê) veqetand û navê wê dani Kurdistan." Sultan Sen-cher, bîraziyê xwe Suleyman Şah Ayba ji kîribû waliyê Kurdistanê. Suleyman Şah pişti ku bû waliyê Kurdistanê, bajarê Bihar ji jî xwe ra kire serbajar.

Lî gor Mustewsi, sinorê Kurdistanê dîgîhişte Îraqa Ereb, Îraqa Ecem, Azerbeycan û Diyarbekirê.

Bêguman navê Kurda bixwe dî belgên hin kevintir da ji heye. Lê welatê wan Kurdistan, dî wê demê da bî hinek navêne din dihat naskîrin. Heta sedsala 13'an ge-

lek niviskar û şayirê Ereb û Farîş yan ji yê ku bî van zimanî nivisine, pîr caran qala Kurdan kırine.

Mesela Rûdaki (salên 857-890), Firdewsi (salên 1141 - 1209) şayirê navdar in ku bî Farîsi nivisine, dî şêrên xwe da qala Kurdan kırine. Hur usa ji, diroknîvisê (tarixnîvisê) weki İstexri (sala 951), Mesûdi (sala 943), İbni Miskewe (sala 1030), Yaqût (salên 1179-1229) û İbni Esir (salên 1160-1234) ji dî pirtükên xwe da lî ser Kurdan gelek tûşt nivisine.

Jî nivisên wê demê tê femkîrinê ku dî navbera sedsalân 9'an û 13'an da Kurd dî nava Farîş, Azerbeycan, Ermenistan, Cibal û Zewzanê da lî ciki pîr fireh dijiyan. Disa mesela, jî nivisê İstexri (dî sedsala 10'an da jiyaye) tê femkîrinê, weki lî Şecestan, Esedabad, Şiraz, Kerman, Xûzistan û Meraşê Kurd hebûn.

Beri bikaranina gotina Kurdistanê, gelek niviskaren Ereb (yan ji yê ku bî Erebi nivisine) ji "El-Zewzan"ê (Zozan) wek welatê Kurdan behs dîkin. Lî gor Muqeddesi, Zewzan, bajareki Cizirê yê İbni Umer bû. Lê lî gor İbni Esir, ku ew bî xwe ji Cizira Botan e, Zewzan du roj ji Mûsilê dûr bû û sinorê wê digihişte heta nêzikê Xilat û Selmasê.

Çavkaniyênlî islami pîrî caran gava ku behsa dewra beri Selçûqiyan dîkin, dî çarçeva Xilat, Ermenistan, Azerbeycan, Cibal, Farîş û Zewzanê da qala Kurdan dîkin. Mesela İstexri navê 33 eşirên Kurd dîde ku lî nehiya Farîse dijiyan.

Mehmûdê Qesgari, yek jî zanayê Tîrkan ê navdar e ku dî sedsala 11'an da jiyaye. Ewi, xeriteyek dî

pirtûka xwe da "Diwana Ferhengê Tîrki", ku bî zimanê Erebi ye û lî bajare Bexdayê da hatiye nivisarê (çapkîrin), bî ci kîriye. Dî vê xerîte da jî bo welatê Kurdan, bî Erebi "Erdul Ekrad" (erdê Kurdan, welatê Kurdan) hatiye nivisin.

Herweki Tîrkan-Osmaniya hindama Dersimê kîrin Kurdistan û bere bere ev nav lî her hindamê Kurdistanê belav bû.

Lê texmina me ew e ku, hêj beri wan tiştan û gotinan, beri nivisa Ereban, Farisan û Tîrkan, Kurdistan zûva navê welatê xwe, ku ewana ji kevnare da tê da jiyane, danine Kurdistan û wek erdek, welatek, yeki tam fem dikîrin û jî bona yekbûn û azadkîrin wi şer dikîrin. Kurdistan naveki gelek kevin û qedim e û wek welatê dînyalikêye kevnare yê mayin tê fem û hesabkîrinê. Hema bona vê yekê bû, bona femkîrina welatê şirin, Kurdistan bû ku şair û hekimê Kurdan ê mezîn Seydayê Melayê Ciziri dî sedsala 11'an da nivisiye:

*"Bî dil atêş, ceger buryan im,  
Lew perişan im û pîr êşan im,  
Aşiqê nazîk û mehbûban im,  
Nêk bê ser û bê saman im,  
Gulê baxê İrem ê Botan im,  
Şebçiraxê şebê Kurdistan im."*

A ev bû bî kurti, kurt-kurmanci diroka gotina "Kurdistanê". Yê ku jî xwe û miletê hez dîke. gere wan tiştan bîzanibe, weki dî nav miletê mayin da serbilind be û tarûmar nebe.

**Keremê ANQOSI**  
Berpîsiyarê weşanên  
Radyoya Kurdi Li Tibilisê.

# ŞERÊ XAL Ú XWARZIYA

Lolo lawo, lolo lawo...

Lolo lawo, lolo lawo...

Nîkarim bêjîm birano,,,

Herin lo lawo,,,

Sibe bû şereki lî me qewimi,

kulavê, kaniya nazê bîşewite,

tu lê, sed cara lê metele.

Mîn dit Keremê lawê Mîstefa,

lî malê siwar bû wej gundel e,

Rext û qabêd şeşxanê pişta xwe girêda,

mirata modoliyê dabû mil e.

Hûn rabin bala xwe bîdîne çeperêd

neh xal û heft xwarziya mutabiq û beramber û

muqabil e.

Herîne lo lawo şerê neh xal û heft xwarziya Xalîq

dizane,

axirdewr e, erd hejiya bû zelzele.

Sibe bû şereki lî me qewimi lî mîrga Kulavê,

Kaniya Nazê bîşewite wêrane bîlîndeciya.

Mîn di qerte, guhê me xiste qêrinêñ qizan û

nûbûkan,

wîşe wişa mirata modoliya,

Şerqinê çeleng-siwar e, nalina biradera, şerqinê  
canbêzara

heytênêñ kurêñ bava, Şahinê reşboz restalan, ne-  
wala baba

kalina berxan û miyan.

Hûn rabin bala xwe bîdîne çeperêd neh xal û heft  
xwarziya,

Xal û xwarzi lî Kaniya Nazê,

mîrga Kulavê talo leme girtî lî hev aliyanê.

Dûkêl û dûmanê xwe dabû bîniya çiya

Bîrinê xalan û xwarziyan, dayik evdal e,

xwin dikişê binani cokan û kaniyan.

Şereki zor û zorbeyi zorgeran e

dayik dêranê zelzele ye, erd hejiyaye.

Nîkarim bêjîm birano,,,

Herin lo lawo, sibe bû dîlê dayika reben yane, sed  
car yane yane..

Dînya dewr û axîrzeman e

Şerê neh xal û heft xwarziyan e,

Xal û xwarzi lî Kaniya Nazê, mîrga Kulavê,  
talo leme girtî lî hev aliyanê.

Dûkel û xumami xwe dabû etekê çiyane.

Bîrinê xalan û xwarziyan xwin dikişê binani cok û  
kaniyan e.

Keremo lawo, dayika te hîrça çiya û ser keviyan e  
Gura çolan û çiyan e.

Şer dakete nav herçar gundêñ Tuxuba,

Baba mîletê fesad û bê din û bê iman e

Şerê xwe bîxweyi binani rişa pis e,

Derdê kotibûnê, Xalîq dizane ci derdeki bê du-  
wayi

û gîran û bê derman e.

Rebê alemê tu vi derdi bi ser dînyayê neyne  
serê ci eşira û mîrê musulmanan.

Sibe bû dîlê dayika te reben e dîlani din e,  
lro sê roj û sê şev e dayika Kerem dîl bi kul û

dîlbîrin e.

Rêk û dîrba dîşeqine,

Çavê xwe lî kozi û çepera dîgerine  
Koziya Keremê lawê xwe tê da dibine.

Go: "Keremo lo lawo, tu were şirê memîkê mîn he-  
lali te ye,

Xwe herami te nine,

Ew çepere mutabiqi te xalê te ne, keseki biyani tê  
da nine,

Mîn ji gotina mezîna bîhistiye, neh xalê te hebûne,  
Te heşt xalê xwe kuştîne,

tu were bîde xatîrê Xwedê û pêxembera, qurana  
nebi ne,

Bes gule û barûtê binani taviya teyrokê,  
herê mij û baranê ser çepera xalê xwe da nereşine,  
Feriq birayê bîçûk e bîla ji bêhnê re ber dîlê dayi-  
ka te bîmine.

Lawo lo lawo, lawo lo lawo...

Lawo lo lawo, lawo lo lawo...

Lo lawo nîkarim bêjîm birano,

Mîn di Kerem got: "Dayê mala bavê şewitiyê,  
Xwedê koka te bîqeline, konê te ji nav kona hilîne,

Çi azar û azahat e ji dînyayê nine,

Te nîzani em heft xortê te bûn,

Feriqê birayê te şes xortê te kuştîne,

Tu rabe, bigere nav êl û eşiretên Kurdistanê,

melayeki duwazde-îlim bîne,

Bîla quran û mishef û yasinê lî ser cenazê lawê te  
bîxwine.

Dayê lê dayê...  
Mîn di diya Kerem lez dîke dilezine,  
Rêk û dîrba dîşeqine, çavê xwe li kozika digerine,  
Koziya bîrayê tê da dibine.  
Binani hîrça ser kutka, dev tal û dil birin,  
Xwe li çepera Feriqê bîrayê xwe re dîgihine.  
Go: "Feriq bîrayo, rebê alemê koka te bîqeline,  
ji orta te derine, konê te ji nava kona hilîne.  
Ser dînyayê çi ferqa xwarziyê mîrov û ewladê  
mîrov çi nine.  
Lawo te yê şeş lawê mîn kuştine,  
were bîde xatîrê Xwedê û pêxembera, quranê,  
qurana nebiye,  
Bedbext û tu bî tenê, Kerem bî tenê,  
bila çi wexta nav mala bavê mîn rebenê  
bê war û bê riş û bê urt nemine.  
Kerem mîreki heyf e, navmala bavê xwe da be mîr  
e,  
bila li ber dilê xuşka te bimine.  
Mîn dit Feriq dîgot:  
Xuhê mala bavê şewîtiyê,  
Xwedê koka te bîqeline, orta te derine,  
Konê te ji nava kona hilîne.  
Çi agah û haya te ji dînyayê nine,  
Gotina mîrovê mezîn rast e, derew nine,  
Çi gava jîn bîçîne mala mîra,  
agah li mala bavê xwe û bîrayê xwe nine.  
Tu nizani em neh bırakê te hebûn,  
Keremê lawê te, heşt bîrayê te bî destê xwe  
kuştine.  
Heke tu bawer naki, tu rabe çavê xwe li kozika  
bigerine,  
Meytê heşt bîraya ber çavê xwe bîbîne.  
Dînya ji me ra lazîm nine,  
Bela xwe ji mîn veke, destê xwe ji pê sir û bedena  
mîn bîkşîne.  
Mîn di diya Kerem lez dîke dilezine,  
Çavê xwe li kozi û çepera digerine,  
Leşê heşt bîra ber çavê xwe dibine.  
Binani hîrça ser kutka, dev tal û dil birin e,  
Xwe li kozi û çepera Feriq ra dîgihine.  
Got: "Feriq bîrayo, rebê alemê koka te bîqeline,  
urta te derine, konê te ji nava kona hilîne.  
Tu were bîde bextê quranê, qurana nebi ne,  
Kerem mîreki heyf e, mala bavê wi bê mîr e,  
bila ji ber dilê xuşka te bimine."  
Mîn di Feriq got: "Xuhê, mala bavê şewîtiyê,  
Mîn daye te bextê quranê nebîne,  
Tu here çemîlê Keremê lawê xwe bigire ji kozi û  
çepera bîkşîne"  
Mîn di, diya Kerem lez dîke dilezine, rêk û dîrba  
dîşeqine,  
Çavê xwe li koziya digerine,

Koziya Kerem tê da dibine.  
Go: "Keremo lo lawo,  
Tu were şirê memikê mîn helali te ye, xwe herami  
te nine  
Dînya mîrin e, tu serê mîn ê sîpi ser dînyayê bira  
xwe bine  
Ew çeperê mutabiqî te xalê te ye, keseki biyani tê  
da nine  
Feriq daye mîn bextê qurana nebîne,  
Bes gule û barûta binani taviya teyrokê  
bî ser çepera xalê xwe da nereşine.  
Mîn di, Kerem got:  
Dayê mala bavê şewîtiyê, tu neke nereşine  
Hêşîra binani taviya baranê nebarine.  
Mîn baweri bî quranê heye,  
Mîn çi baweri bî mala bavê te nine  
Çi qol û hesiyeta Feriqê bîrayê te çi nine.  
Mîn di, diya Kerem kûrahiya herdu çavê dertine,  
Çemîlê Kerem digire, ji kozik û çeper dertine.  
Heyla kulê tu bî kul bi, bîkevi mala Feriq de lorine.  
Çi qol û heysiyyeta mîraniya gel çi nine,  
Dugma kuçika çapê dizivirine,  
Tîliya me lî ser pesê dışidîne,  
Çavê xwe lî duguha mirat dîneqine,  
Guleyekê lî bejîn û bala Kerem dixine,  
Destê lawê tini lî nav destê dayê dîgerine, dayê lê  
dayê...  
Diya Kerem leşê Kerem lî ber çavê xwe dibine,  
Binani hîrça ser kutika, rebenê hema dev tal û dil  
bîrin e,  
xwe bî kozîka Feriq dîgihine.  
Go: "Feriq bîrayo, rebê alemê koka te bigeline,  
urtâ te derine, konê te ji nav kona hilîne.  
Te dabû mîn bextê quranê, qurana nebi ye,  
Çi kesê baweri bî quranê nine, lî ser dînyayê fesad  
e,  
din û iman dî serê wi da çînine.  
Mîn di, Feriq got: " Xuhê mala bavê şewîtiyê,  
tu neke nereşine, hêşîra ji dilê kovan nebarine,  
Keremê lawê te guleyek lî mîn daye,  
Mîn agahê ji destê bîrinê nine.  
Tu were lî aliyê piştê bîzivire, ebayê bırakê xwe  
hilîne,  
Dil û gurçikên mîn ber çavê xwe bibine.  
Tu were mehasa mîn ji lingê mîn bikişine,  
Bîla hesreta ava Kaniya Nazê, lî ser dilê bırakê te  
nemine.  
Xwedê xîrab bîke, derdê bîrayê te derdeki zor  
muşkul e, zor çetin e  
Xuşka Feriq lî aliyê piştê bîzivire, ebayê bırakê  
xwe hilîne.  
Dil û gurçikên bîrayê xwe ber çavê xwe dibine,  
mehase ji ser linga dikîşine,

Hetani diçे qurteke ava Kaniya Nazê jê ra bine,  
Mebêje Feriq, wesiyeta Xwedê tehwil û temam bi  
ci tine.

Mîn di, diya Kerem dike û dîlorine,  
hêsiра bî ser cenazê neh bîra û heft xortan  
dibarine,

Go: "heyfa mîn şerê egida nine,  
heyfa şerê neh xal û heft xwarziya ne,  
heyfa mînê li wê heyfê têñ, zarokê wan hûr ìn,  
xîzanê wana şepirze ne,

Çend keçen bê kezi li orta meydanê,  
li nava çadır û kon û perde mane, bê xudan û bê  
xweyi ne.

Şerê xwe bixwetiyê ye, binani rişa pis e, derdê  
koti tuneye.  
Xalîqê jor dizane ci derd û derman û imkana wê  
çinîne.

Rebê alemê tu vi derdi ser dînyayê,  
ser ci eşir û mîrê musulmana nebini û kes nebîne.  
Lo lawo, lawo...,

Berevkar : NEWROZ

## " PIX "

VAZGAL

Lî Kurdistanê, lî bajarê Sêrtê jî xelkê Perwariyê dinek bî navê Ehmo diji. Eh moyê bejînzirav û jar wek piraniya dinan şev û roj dîgere, jî pişt va nêziki mirovan dibe, "pix!." dîbêje û wana ditûrsine. Ki dizane dibe ku bî vi awayi heyfa xwe jî insan û sazûmana zordest distine.

Piştî hukma faşist ev Eh moyê din, lî Sêrtê leşkerên Türk şeveki rakire ser piyan, hêwîr ze xîste nav û wana mat kîr.

Wan rojan hukma faşist û hevalbendêñ wana lî ser welatperwerên Kur dan bêeman teda û zulmê pîr kîribûn. Bî dek û dolavan, bî propaxandêñ der ewin dîxwestin jî bo êrişê arone peyda bîkin. Dîgotin "terorist wê bavêjîne ser bajarê Sêrtê.

Dî wan çaxan da şevez dilê Ehmo gerin xwest, rabû derkete der. Lî kuçe û zîkakan carna digeriya carna ji jî ci hildipekiya û bî rîva dîçû. Berbi deriyê nizamiya eskeran çû, gavêñ xwe nerm û hêdi hêdi avêt, nêzikê nobedar bû û nişkêva "pix" got. Esker jî xwe va çû, tîving jî destan kete erdê û herdu bî hevraz deng derxîstîn. Ehmo keniya û dî riya rast û fireh da disa banzda vi ali wi ali, rîvaçûyina xwe

dom kîr.

Bî dengê ketîna esker û tîvinga wi, nobedaren dîn rast û çep gulle barandin. Alarmê lêxistin û Ehmo dan ber gullan, hemû bajêr bî dengê gullan lerizi. Lê nikarin Ehmo bîkujin. Ehmo carna xwe dide aliyê çepê, carna aliyê rastê û carna ji raste-rast direviya, saqoyê reş û periti ji navmilê wi şîqtî kete erdê, lê ew nesekini û filiti. Ew jî mîrinê filiti, lê ehlê Sêrtê heta sîbê jî destê esker û polêzen xwinxwar nefilitin. Saqoyê Ehmo wek delileke mezin birine cem sergerdeyêñ xwe. Sîbehtirê miroveki istixbaratê (MIT) saqoyê Ehmo naskir. Lê jî millet veşartin. Disa dîgotin ku terorist işev avêtîne ser eskeran, şer çêbûye û reviyane nav bajêr.

Derewêñ wan jî ali Ehmo hat pûçkîrin. Heval û hezkîriyê Ehmo pîrsa saqoyê wi kîrin, ew ji hal û meselê jî wan ra got. Dema virêñ wan eskerê bûn, hatin Ehmo girtin birin. Lê pîr nebori wi berdan. Jî wê bûyerê şunda hemû kes jî Ehmo daxwaz dîkin ku bîbêje ka çawa eskeren Türkân tûrsandiye, wana kîriye ele wat û jî destê wana filitiye.

# "RİYA BERBI TAVÊ"

Ew ji wê nifşa ronakbiriya me ye, ku dî salê 50 da dest bî xebatê kiriye. Cehdand da ku xebat û kîrînê nifşa beri xwe bide mehkemkîrin, lî pey ronahiyê nû geriya bona bêtir gulvedana çanda me.

Rizaliyê Reşid dî gundê Kurekendê da (nihâ Ferik, nehiya ecmiyazinê) hatiye dînyayê. Xwendîna bîlind lî Erêvanê stand, lê minani hineka derheqa jiyana bâjari ya "rehet" da nefikiri.


Vegeriya gund û xwe pêşkêsi xebata perwer-dekirina zarokan kîr. Weke sih sali bû mudurê dîbistana gundê xwe, zarok hini xweşi û şirinaya zîmanê dê kîr.

Gotineke pêşîyan dîbêje: "Bî gulekê bahar nayê". Hela zû va wexta cara pêşin ez çûme Kurekendê û bî Rizali ra bûme nas. Ez gihiştîme wê bawerîyê weki dî gundeki da ronakbirek ji dikare gelek tişt bîke. Xasîma wexta ew dî mala eşirê da mezîn bûye, ne tenê bî kîtêban, lê bî erf-edetên miletiyê hatiye terbiyekîrin. Wexta pê ra qise dîki, ji kurmanciya wi ya delal, rabûn rûniştandinâ maqûl, xeysetê wi yê milûk tê nabi. Bî ciwanêñ gund ra qise dîki ku ber destê dersdarê xwe yê hezkîri hatîne terbiyekîrin, şâ dibi wexta merifet û maqûliya wan dibini. Û hingê disa gotna pêşîyan tê bira te: "Dersdarê wi dersdar bûye."

Rizaliyê Reşid bona xebata xwe ya dersdariyê ya pîrsale hêjayî nav û hurmeta bîlind bûye. Bî madalya û hurmetnama va hatiye rewakîrin.

Xên ji dersdariyê, em Rizaliyê Reşid herweha wek şaireki navdar dinasin. Û hergav dema gotin tê ser efrandinê Rizaliyê Reşid, navê pîrtûka wi ya ewlin dikeve bira mîn. "Berbi Tavê". Pîrtûk dî sala 1964'an da neşîr bûye. Û eva weke sih sali ye, weki şair Rizaliyê Reşid bî wê tirêja tava xwe bawer e.

*Bavê mîn tûm mîn dînhêri  
Û xweziya xwe bî mîn dîani,  
Çawa gul dîdum lî rû dînê bîn  
tava vi ezmani.  
Mîn go: Bavo tê bîkûrînê,  
vi erdi vi mîkani.  
Gulê şayê te nukandiye,  
roja mîn xweş te ani.*



Rizaliyê REŞİT

Rizaliyê Reşid şîera "çê nake". Ew çi dîrêj e ser kaxez, ji dîli wi yê temiz, ji pencê tava ruhê wi dîxulîqin. Xetêni wi bî gili-gotinê kurmanciya dewlemend in. Lema ji ji bira meriv naçin.

*Zeri kelma te şîrin e,  
hînek sekirê nevat tev e,  
Herçi kelma şîrin seh kîr,  
bê wê sedê tucar nabe,  
Heft xweziya mîn ewi xorti  
seda şîrin ra heval be,  
Zeri lutfê şîrin bêje:  
Xorto zeri li te helal be.*

Tama (lezzeta) efrandinê Rizaliyê reşid gund, çiya û baniyêñ zarotiya wi ne, tebiyeta bedew, huba dilê bengi, hîzkîrina berbi weten e (niştiman e). Xetêni şîrêni wi, bî hemdê xwe, mina ava kaniya zelal dîxulxulin, bêyi deng û awazêñ qelp.

Wek şairê esli ew bî serpêhatiyêñ gelê xwe, wela-tê xwe va diji, bî serkevtinêñ wan şâ dibe, berxwe dikeve bona kîmasîyan.

Min dixwest du gotin derheqa qelibotkîn wi da bigota. Efrandinê bî vi rengi, dî navâ literatûra me da zehf ninin. Rizaliyê Reşid, ji wan şairêni me yên pêşin bû, ku qelibotkîn nivisin. Dî qelibotkan da ew li ser wan kîmasîyan dîsekîne, ku hela (hej ji) dî navâ cîvatê da, dî xeysiye hînek merivan da hene. Badîlhewa nine, weki gelek qelibotkîn wi dî nav gel da ezbere tê gotin. ("Xezûrê kîfxwes, bûka bê zîman", "Hewi ku heye", "Malwêranê xweyi du jîn" û gelek gelekîn mayin)

Rizaliyê reşid, şaireki lîrik e, xwedi raman û hisêñ nazik e. rast e şairê me yê hezkîri idi 60 sali ye, lê kela wi ya efrandariyê hela hê gurr e.

**Babayê KELES**  
(Jî "Riya Teze", 30.11.1989)

# BEYANNAMEYA ŞÊX SEİDÊ PİRAN

*Ev belavoka han, ji ali Şêx Seidê nemir va, di Adara 1924'an da bi Kurmancî û Türki hatiye nivisandin û li Kurdistana Türkiyê hatiye belavkirin. Belavok li bajarên Erzurom, Wan, Bedlis, Diyarbekir, Xarpût û Meletiyê belav bûye.*

*Lî gor agahdariya kovara "Çarçira" (Adar 1989, hejmar: 4,5,6-Stockholm) ev belavok di sala 1960'i da di kovara "Roji Nwe" (hejmar: 7, sal yek, Teşrini Yekem, 1960, Çapxana Kameran-Silêmani, rûp: 36-39) da, bi zaravê sorani hatiye çapkırın. Kovara Roji Nwe ji, vê belavokê ji İsmail Heqi Şaweys gurtiye. Belavok an ji ali İsmail Heqi Şaweys an ji, ji ali berpîrsiyarên kovarê hatiye wergêrandin. Mixabın ku eslê belavokê, ango Kurmancî û Türkiya wi nehatiye çapkırın.*

*Em bawer in ku di wê demê da gelek belavok hatibin belavkirin. Lewra Şêx Seid bixwe, bi xebateke rêxistini hazırlarıya serhildanê kiriye, lî gor dewra xwe insaneki zana û têgîhiştî bûye, di pîrsa netewayî da bi bir û baweri bûye ku ev baweri li dadgeha Diyarbekir a 'îstiklal' ê da ji hatiye xuyan.*

Mixabın ku Tîrkan, Osmaniyan bi navê din û xelifetiya islamê, ev 400 sal in ku me hêdi hêdi dil û bindest kîrine, berbi tari û nezaniyê birine û riya nebûnê anine ber me. Ew bixwe miriyê behra zîndîyan dixwin û me ji bi xwe ra dîkşinîn. Ëdi xwe çemandîn ji bo zordaran û tariperestan.

Van Tîrkan, her ji mêt va bi koçeri hatîne nav me û bi dek û dolaban xwe damezrandine, welatê me zest kîrine û wêran kîrine. Kurdistan tu cara weke iro kavîl nebûye û weha nebûye hêlinâ pepûkan, cihê gur û Bozkurtê Tûrani. Welatê me wîsa bêbeş û hejar nebûye, lê rewşa me ya iro perişani û malwêrani ye, û tu Kurdek, tu dindarek viya qebûl nake.

Lî ser me hemûyan ferz e, ku em xwe ji vê jiyana tal û bêbextiyê rizgar bikin, ji bo vê yekê pêwist e em ji riya rasti û heqparêziyê dernekevin, ji mîrinê netîrsin, ji riya heqstendinê nerevin. Ji bo hestiyê navdariya bapiran, gel û welatê me, em canê xwe fida bikin.

Lî hember serbazên (sûbay) Türk, bi

taybeti ji li hember zabit, serok û qu-mandarêن tîrk, ku di derheqa jîn, keç û zarokêñ me bi zalimi bîzivîne (xebitîne) û bi eksa din kuştînê kirune, em rawestin û tola wan bêgu-nehan, bê deselatan (rebenan) û bêçekan bistinîn, xwina wan li erdê nehêlin. Lî li hember dil û birindaran nerm û bi rehim bin.

Pêwist e em li hember serbazên tîrk ji, ên ku şer nakin û xwe teslimi destê me dîkin, nerm û bi rehim bin û wek birayê xwe restari ligel wan bikin (rê nişanî wan bîdin).

Di şeran da destên we nelerizin, ji mîrinê netîrsin, çunki jiyaneke vala, pûç û dûr ji dînyayê, jiyana bêbeşi û bedeselati, jiyana pir bi xem, cefa, tîrs û keserbari ji bo me hemûyan şermezari ye. Mîrînek azayane ji wê jiyana hêsiri gelek xweştir e.

Aşkera ye ku tîrk bêsoz in, û li hember kurdan pir zordari û nemerdi dîkin. Divê em kurd ji, derseki wîsa bîdin Tîrkan ku tu cara ji bir nekin û rûreşî û pirêzêñ Tîrkan ên guriti ji bo hemû cihanê aşkera bikin û bîdin

xuyan ku çawa bê feyde, wêranker, gur, hov û xwinxwar in. Dî şûna ku em dî nav van zordaran da bê feyde bijin, dî riya heq û rizgariyê da şehidbûn, bî komiti mirin şirin û xweştir e.

Heta mirinê jî bo wan birayên kurd, jî bo wan zarokên nazdar ku wê li dû me bijin, divê em temrin û dersan jî canfidaiya xwe wergîrûn û jî bo duwe-roja jiyana wan gewherek pêşkêş bikin, da ku jî riya heq û rizgariyê dernekevin û berbi ronahiya jiyanebicin, bîlivin.

Hewl bîdin ku em bî rûyekî sor bijin, ku em hemû dî riya azadi û serfiraziyê da bî komiti bîmrin, nav û nişanek bîlind jî bo netewa xwe peyda bikin bî yekiti û birati. Berxwedan û hewildana bî komel pîr bîlind e, û divê bî hemû dînyayê bîdin xuyan ku em li hember zordari û bê edaletiyê seri hildîdin û dî berxwe dîdîn. Divê em hewl bîdin ku dî herdu dînyayan da biratiya xwe ragîrûn û heqparêziya xwe xwedi kin, da ku li hember Xwedê, heqiyê û mirovatiyê şermezar nebin û li herdu dînya bêpar nebin.

Ey gelê kurd, başı û xîrabi bî destê me ye.

Bî bir û baweriya me bî xwe nebe, em tucar rizgar nabîn û jî tariyê derna-kevin ronahiyê. Divê em dî berxwe bîdin da ku herdu dînya bî destê me keve. Em dî bin zordariya Tîrkan da pîr mane. Eger çavên me tim li wan bin, em ê her bê dest, bê can, geni û rizandi biminin. Heta iro ev çar çerx e ku Tîrkan kin û dijminati, zexeli, bê-kari, hevkuştin, talankîrin û malwê-

rankırinê dane me. Tucar nezaket, .başı, nermi, jî hev ra rûmet nişan-dan, hevdu esükîrin, zanin û huner hini nekirine, hemû deman rê û ci-hîn koçeriyê nişani me dane.

Heta kengê em ê weha bê feyde dijminê hev bin? Edî lî ser rê û rêcîka Tîrkan cûndin bes e... Alikariya Kur-dan digel "Kemaliyan", ne jî bo dînya ne ji jî bo axretê nayê efûkîrin. Edî berbi ronahi û azadiyê, berbi birati û mirovperweriyê bîmeşin. Me Kurda jî dewra "Mem û Zin" heta iro jî xwe ra jiyanek çê nekir, me hê-viya Ahmedê Xani bî cih nean-i, lewma em perişan û belen-gaz dijin û këfa dijmin lî xwe ani.

Edî canê Ahmedê Xani, den-gê şirin a azadi, Mem û Zinê bîlind bikin, hêviyên bav û kalêñ me bije-ninin, armanca wan bî cih bi-nin.

Ey gelê Kurd!


Em baş dîza-nin ku dî rojêñ reş û tengasi da Türk hawarê jî


Kurdan xwestine, lê dî rojêñ xweşiyê da netewaya kurd nas nekirine û jî destkeftiyêñ me, me Kurdan bêpar hiştine, û ne ku tenê sozê xwe şikandine û bî cih neanine, her wişa dema ku keysê ditine çek û sungiyêñ xwe derxistine û xistine singê Kur-dan. Bî vi rengê nemerdi, bî xiyanet xelata kurdan dane.

Fe'teberrû ya ûle l'ebsar.

Adar, 1924

**ŞÊX SEÎDÊ NEQŞÎ - Piran.**





*Dayê AMÎNE*

## "Kurên mîn dî rîka namûs, şeref û azadiya Kurdistanê da şehid bûn"

*Me weşanduna nameya Dayê AMÎNE bî munasebeta 8'ê Adarê Roja Jinên Dinê pêwist dit û em bawer in ne tenê jinên Kurd, her wîsa wê hemû jinên cihanê derseki ji vê jiyana pirozbahi derxin.*

Ez xelkê bajarê Sîneya qehreman im. Navê mîn Amine ye. Emrê mîn ev sal xwe li 44'an dîde. Jî ber vê hîndeki ez him pêşmerge me, him ji dayika 4 pêşmergeyan im. Hemû hevalen pêşmerge dibêjîne mîn, "Dayê Amin".

Eger ez kurtejina xwe ji we ra bêjim, ez bawer im weki jina hemû jinên Kurdistanê ye. Lê ewa ku ji mîn û xelkê mîn ra cihê serfirazi û serbilindiyê ye, ev e ku ez bî çar kurênen xwe va dî nav refîn pêşmergeyan, bîzava rîzgarixwaziya kurdistana Iranê da, bî Hîzba (Partiya) Demoqrat ra lî hember zulm û zorê xebatê dîkim û dî vê rîyê da mîn 4 kurênen xwe ji dest dane. 3 kurênen mîn, bî gotineke rasttir kurênen Hîzb û şoreşê, lî çeperên azadi û serbes-tiyê da şehid ketîne û yet ji dî nav meşqa şerê şoreşvaniyê da bî girani birindar bûye. Bî alikariya Hîzba me û dost û hogîren mirovhiz û xerxwaz, kurê mîn ê birindar birin welatê Swêdê û lî wir lî ser dixtoran dîmine û ji bo leşsaxiya xwe wextê xwe diborine.

Kurtejina min bî vi awayi dest pê dîke. Ez qiza malbateke jar û belengaz im û lî bajarê Sîne (Sinandej) hatime dînyayê. Jina me ji weki hemû kedkar û zehmetkêşen Kurdistanê, dî nav zelûli û perişaniyê da dimeşıya û bo pariki nanê helal bî şev û roj me xebat


dîkir. Bî kurti me jineke neji û nemîr hebû. Malxoymala mîn karker bû. Em xudanê 7 zarokan bûn, 4 kur û 3 qiz bûn ewana.

Em dî nava şerê jinê da berxwedan û xebatê elîmine. Lê eger em lî jîna xwe ya borî binîhîrin, em dîbinin ku çend çetin û dijwar bûye. Her ev çavkaniya jinê û rastiyê rewşa me, em xîstîne refîn şoreşê. Xasîma Hîzba Şehid Qasimloyê nemîr, pêşengê mezîn û nemîr ê gelê me, bersiva van hemû xwestekîn dî nav cerg û dîlê me da ani nav meydanê.

Mîn ji vê yekê dî sala 1979'an da keyseki baş zani û ketime nav refîn HDKI (Hîzbi Demoqrat a Kurdistanâ Iran). Lî bajarê Sîneyê mîn û zarokênen mîn, lî nav wi bajari da bî çelengi pişkdariya hemû rewş û rîkênen xebatê kîr. Her ji ber vê yekê mala me hertîm weki meqereke pêşmergeyan û Hîzba me bû.

Wextê ku rejîma melayêñ kevneperekî êris ani ser Kurdistanê û xasîma ser bajarê me, em pêşmergeyên Hîzbî lî ser destûra Hîzbî, ji ber ku bajêr xîrakîribûn, ji nav bajêr kişiyan dere û daketîne nav deşt û dol û ciyayan. Hîngê rewşa xebata me guhuri û em bûne partizan.


Ev sal dîbe sala 11'an ku ez tevi xweşmîrêñ



Şehid: PERWİZ



Şehid: SIROZ



Şehid: XUSRO

demoqrat li serê çiyayên Kurdistana qehremân dirêji dîdime xebata azadi û xudmuxtari û demoqrasiyê. Pêştir ji mîn got 3 kurên mîn ên bî navêni Siraz, Xusro û Perwiz dî rêka armancê gel û welati da canêni xwe kîrîne qurban, yek ji bî niverîhi xîlas bûye. *Lê eger bêñ û ji min bipirsin, tu xemgin û pirkovan i?* Ez dîkarim bêjîm, naxêr, kurêni mîn dî rêka namûs, şeref û azadiya kurd û Kurdistanê da şehid bûn. Rast e, jina wana kurt lê bî şêrane, serfirazane û pirrûmet bû. Diyar e weki dayika ki ji me heye ku bo cergê xwe neêşin, dîlkovan û ciğerxwin nebîn. Lê em gelê Kurd û xasîma gelê me yê li kurdistana Iranê, bî pêşengiya Hîzba Demoqrat, bî başî nişan daye ku şehidbûn ji me ra armanc nine, em ji bo jînê şer dikin. Mîrin, dî rêka azadi, aşiti û biratiyê da pir xweş e. Eger bî hev ra, welat û gel rizgar bibe û ev şerê neheq li ser me xîlas bibe, dîbe em cangori bibin, qurbanan bidin. Xasîma dayikêni kurd, jîn û qizêni Kurd dîbe ku şervanan xwedi bikin, mezîn kin, pê bergiri û evindariya azadi û serbestiyê te jar bikin û bîşînîn nav meydana xweşmîriyê. Jî mîj va hatîye gotin: "Şêr şêr e, çi jîn be çi mîr be".

Rêka azadiyê û şoreşê xwin e, agîr e, renc e, bîrçiti ye, pir dijwar û çetin e. lê dî vê rîkê ra mîrov û mîrovati xwe dîghîne heq û mafêni xwe.

Bawer bikin dî nav wê dijwariyê da, jîn pir xweş e, çunki bî tevayı meriv bî hemû eş û janan va nasiyar dîbe. Ew roja ku mîn kîf û seyan dikir ev bû ku, pêşmerge rîz dîbûn,

dadîketin nav deştê, lawij û kilamê azadi û Kurdiyê dîgotin. Wextê dilan dîgirtin, wextê ji avê çemêni boş ên bîharê derbaz dibûn pelav, dersok û tiştêni me dî avê da dicûn, dengê kenin û kîfa me bilind dibû. Pir xweş bû. Mîn nedîzani ku ez berbûki me û tu şane ji nine ez berbûkiya azadiya me, heta serkevtinê em ê vê dilanê xeberdin. Mîn pê xweş bû, ku dî vê dilanê da, ku bêguman wê rojekê wîsa lê bêtin, bî hezaran dayik û xuş dest daba çekêni şehidan. Çi kur an yarê wan, tevi me dî vê govendê da kilamên benginiyê bigotana.

Birano, ez pir serfiraz im ku, ev roj weki pêşmergeyeke kurdistanê dî nav refêni HDKI da xebatê dikim. Her wîsa serbilind im ku dayika 3 pêşmergîyen şehid û bîrindareki me.

Lî vîra ez dixwazîm careke din bêjîm, wek dayikeke şehidîn rêka rizgariya Kurdistanê:

Bîla hemû neyarêni gelê me û şoreşa me bîzanîn ku, şehidkîrîna pêşengê Hîzba me, serokê navdar ê Kurd, mamosteyê jêhati û nemîr Dr. Qasimlo nikare me ji rêka me bike, agîrê azadi û rizgariyê dî nav dîlê me da bivemirine. Ocaxa gelê me kor nine û natemire. Ew gelê me, wê her wîsa şehid Dr. Qasimloyan bîfîrinin. Bî kurti heta gelê me û çiyayêni me û dostêni me hebîn, em ê her hebîn, berxwedan û serhîldan hetani serkevtîna gelê me wê berdewam bike.

**Dayê AMİN**  
Lî Kurdistana Iranê.

# KÍ DIBÈT MIRI!

XELİL DİHOKİ

Li vi bajeri (1)  
Ne kew awazeke dibetin!  
Ne ji laye geno ti xorta.  
Denge straneke dëtin!  
Ne zaro yartya dikeni!  
Ne zeriyen seng ti ciwan,  
Kezi ti biskia divehunin.  
Ne ji se dikeni!  
Ev ci deme e?  
Metin yê pir mij ti tem el  
Silav ti rubar ti kani li dipeynin.  
Hewar eve ti sitem el  
Teragehim gelo cima.  
Ev bajere hund bi xem el  
Lé deng hat ti axinek pé ra.  
Bol ti ciya le vegera.  
Di van roja da, diriya hejtya.  
Stereke ges ji esmane.  
Tore Kurdi, ket li rijtya.  
Di van roja da.  
Heval "VEHEL" i (2) wexer ku.  
Tiji cerg li himayen tev welatiya.  
Kul li xem kir.  
Gohusi bum, dile man sot li kiziri.  
Ey "şanî" hemi dema.  
Semalka jne hulkur.  
Ki dibet muri?  
Bawer bike, ew mirove.  
Ji rastiya ra, cepera ji singe kwe çeket.  
Qet namurit.  
"Yê xwe dusojit, da reka yen di ron biket" (3)  
Yen di dinzmin.  
Bes ew e li esmanî difirin.  
Yê ber pere diroka wi.  
Sipli ti paqqi bil namurit..  
Lewra heval.  
Navê te li di nexseyâ vi welati da.  
Hate çandun.  
Helbesten te, ne den dizin.  
Ne firozin.  
Di kurattyâ tev dila da.  
Dene gotin.  
Eva çewa, de ben muri?  
Tu saxi li her haziri.  
Qet namuri...  
Qet namuri...

(1) Helbest "bajere" Armeñîye ye.

(2) "Vehel", nasmavê helbestivanc nemir Seban Ehmed Schadî ye.

(3) Ji helbestivanc nemir Nazim Hikmet wergüntiye.

# Jİ DİROKA KURDISTANÊ

Jı Gernama  
**EWLİYA ÇELEBİ**



## ÊSA KUTANA PÊNCİ DARAN

Şikir jı Xwedê ra, Kela Bedlisê dî sêsema bist û pêncemin a Remezana 1065'an (29'ê Tirmeha 1655) da bî hêsanî hate stendin. Seresker Yusuf Kethuda tevi hezar eskerên bijare û parêzkar hatin tayinkırın, sêsed odayêن quesra Xan, xezine û çilxaneyên wi hatin zeftkırın û bî mora vi feqirê (E.Çilebi xwe xesd dike) hatin morkırın; disa derê kelê jî ali derva va hate girtin û berbi rezê Xan deh hêz Sekban û sarica, deh serdergevanêن bijare, jî hêza Wanê eskerên bijare û serapê çekdar tevi Efendiyê Diwanê Gınaizade Ali Efendi hatin şandin. Ü pişti ku sêsed û şest odayêن der û hundır... hatin zeftkırın hemû cebîlxane, xezine û çilxaneyên Xan ketin dest û bî mora serbazê dergevanan hatin morkırın. Pişti ku Serbaz heta kela jêrin, hema wê gavê Yusuf Kethuda, serdarê kelê Karaali Ağa, agayêن kelê, serbaz û heftsed kesên dîn, ku dî kelê da mabûn û şer kîribûn, desten wan lî pişt serê wan qeyd û bendkiri tevi alaya mezin dan pêşıya xwe.

Werger: DILSOZ

Gava ew tevi alaya mezin bî rêva dicûn, her yek jî wan wek berxan dimariyan bî hewarêن "hey lawo!", "wey dayê!" û "wey bavo!" digiriyâن û wîsa hewar û fizarek ketibû wê derê ku, te digot qey roja meşerê ye. Bî vi halê ne hal heftsed kes qeyd û bendkiri, li pêşberi konê paşa li benda celadkîrinê dîsekinin. Paşayê adîl dî binê sidara konê xwe da, li ser kursiyê rûnişt û got:

- Vana çî ne?

Yusuf Kethuda got:

- Vana ew kes in, ku lî kelê lî hember padişah seri rakîrin û şer kîrin.

Paşa got:

- Lî ew heftsed û pênci kesen destgirêdayî û cigersotiyêن ku gavki berê min wana azad kî bûn?

Yusuf Kethuda got:

- Sultanê min, wana, ew kesen ku bî eman ala rakîrin û bî eman jî kelê derketin, ku gjist bajari bûn, te azad kîr. Lî ev heftsed kesen

han, peyayê Xan in û pişti emanê me xapandin û dî kelê da di berxwe dan. Vana ew kesen ku, jî bî kuştina wan sê roj berê ferman hatibû. Ferman ê sultanê min e, got û dengê xwe bîri. Lê dî vê diwanê da bî hezaran kes li piya, "gelo wê halê van insanan çawa bîbe", digotin û hatibûn temaşê. Celadan bî qevda şuran girtibûn û xwe amade kîribûn.

Hema wê gavê Paşayê mezîn got:

- Kanê serdarêna vana yên bê edeb? got û pêra serdarêna wan anin pêş. Paşa dit ku, serdarê pis bî navê Karaali meriveki reş, eşqiyaki pis ku kuştinê heq kîriye û serseriki ye, lê paşa kûr û dûr bala xwe dayê:

- Lê vana ci ne? got.

- Vana xizmetkarêni wi ne. "Zû cellad!" got Paşa û hema wê gavê cellad, axayê kar û barêna hundırı û xizmetkar ketin nava wan û hanhanka heftê kes jî nava wan hilbijartın û cendekên wan ên gence gencekiri li ser hev kom kîrin. Bî hikmeta Xwedê, Recebê Abaza yê xizmetkar heft derbêna şûr li yeki jî wan xist lê derbêna şûr bî qasi mîsqaleki laşê wi nebiri, ku wi jî vana heşt kes serjê kîribû. Wi disa hêz da xwe û wîsa şûrek weşand ku, ew kesê han sed dev û rû li erdê pij bû, rabû piya û got: "Eman (hivi û rica) Paşa, ez bê sûc im û xeribeki terkewelat im. Bavê min ê rehmeti, li Helebê nîvişteki nivisi û dî nava heykeleki (xuyaye ku heykel, minyatûr e) sérkiri da, dî nav porê min da bî cih kîr. Ez jî hemû qeza û belayan heta mîrinê têm parastin. Jî ber vê yekê şûr laşê min nabire." Paşa vi kesi azad kîr û dî hêza Wanê da jî bo kareki dûr dirêj wi tayin tîr. Disa Paşa got:

- Bre Kara Erebê ku dışibe serdarê bela binin! got û dû ra feqir axayê min ê Kara Ali anin, dî meydana siyasi da pê çok dan kutan. "Bre gazi Ewliya Çelebiyê me kîn!" got: Min got "Lîbê Sultanê min".

- Bîbîne Ewliyayê min, do serê sîbê li ser diwanê, êvarê min xewneki dit: Min negot ku, jî nava geleç kîrmoriyan yek jê piyê min gez kîr, lê yên din gez nekirin? Her weha ew kîrmoriya reş a ku piyê min gez kîr ev kafîrê han e, ku gava xwe li kelê girt canê min êşîya bû, zû wi bikujin! got. Gava cellad şûrê xwe tazi kîr, min got:

- Eman Sultanê min, te jo bo xewna xwe got ku, te wi dî xewna xwe da azad kîriye! Wi jî bo xatirê padişah azad bike, got û min erdê maç kîr.

Paşa, gava ku got:

- Vi şeytani rakîn! Hema dî cih da Kara Ali jî cihê xwe rabû:

- Wezirê mezîn, gava ku hûn bûn waliyê Diyarbekir ê duyemin, ez nexizmetkarê te bûm? got, axineki kişand û gîriya.

Paşa:

- Ha.. ew sûcdarê melûn tu bûyi, ku dî şerê Çiyayê Sîncarê da reviya û dî vi şeri da car din ket destê min. Lêxin vi melûni bikujin! Lê gava ku Paşa weha got, min zanibû ku nerm bûye.

Min disa xwe avêt dest û piyê wi û: - Sultanê min, kesê ku we azad kîriye car din nekujin, tesira xewna we ev e, eman Sultanê min, min got.

Paşa, "De hadê bila wîsa be!" got.

Gava ku Paşa jî Kara Ali ra- Lê melûnê melûn, gava tu li Diyarbekir xizmetkarê min bûyi çîma tu reviyayı? got, Kara Ali got ku:

- Wê çaxê pîrsiyara "çîma hespê min ê kehêl birindar e?" li min hate kîrin, te li pêşberi hemû xelkê pênci dar li min xist û ez di nava xelkê da ruswa bûm. Jî ber vê yekê min dî şeveki da xwe jî Sîncarê (Çiyayê Şengalê) avêt Mîrdinê, jî wê derê derbasi Hesenkêfê bûm û jî Hesenkêfê ji derbasi Bedlisê bûm û li ba Xanê Bedlisê bûm xwedi mal û jîn. Jî wê demê vîrda kula pênci daran dî kûraya dîlê min da ye. Ez bê guneh bûm. Hêj jî heqê min li ba Sultanê min maye.

Paşa:- Her weha ey nemerd, eger te bî neheqi pênci dar xwaribe ez jî niha jî bo vê yekê te jî nav esker derdixim û azad dikim, got û Kara Ali hat erdê maç kîr.

Paşa:- Lê nemerd, tê bî nan û xwêya min perwerde bibi û bêyi ku te nav û dengê min, heq û huquqê min ên li ser te bîdi ber çavan, te çîma xwe li kelê girt?

Ali Axa:- Jî bo ku kula pênci daran jî dîlê min derê min xwe li kelê girt, got.

Paşa:- Melûn mîrxas e, tîm rastiyê dibêje, got û qestaneki giranbuha pê da li xwekirin, wi da ba Yusuf Kethuda û azad kîr.

Lê heftsed kesên ku ji kelê hatibûn, şeşsed kes ji wan hêj ji destê wan li ser serê wan li wê derê sekinandi bûn.

Paşa got ku:- Lı gor ferma Padişahê me yê mezin ez ê wana qır bikim. Zû, bila kuştı yêñ kujdaran be. Kînc û eşyayêñ wan ji bila ji kujdaran ra be, got.

Jiber ku kes bi exlaqê Paşa nizanibû, mîn xwe avêt ser piyêñ wi û got:

- Sultanê mîn, do gava ku te behsa xewna xwe ji mîn ra kîr, te sozê azadkirina şanzde keşan ji kîr "Elkerimu iza ahde..."

Gava Paşa got:- Xwedê zane, mîn di xewna xwe da wîsa dit. Nîha here Ewliyayê mîn, ji nava kesen ku wê bêñ kuştın şanzde kes hilbijêre, lê ji bo her yeki ji rhê pêxember ra xitmeki fatihe bixwine, mîn got:

- Ez ê heştê xitum bixwinim, tu ji bo her xitmeki du meriv efû bîke.

Gava rica me hate qebûlkirin, ez di meydana kuştinê da bi banga "fatihe" qiriyam, bi besdariya xulam û nêrevanêñ Paşa mîn di şunda çil merivan da şest û sê meriv neqand.

Paşa got:- Kuro Ewliya, ji bo fatiheki tu hemûyan dibi. Bes e.

Mîn feqirê Xwedê êdi cesaret nekîr û kesen neqandi şand konê xwe û xwarin da wan. Paşê cardin hatim konê Paşa.

Mîn dit ku Paşa hatiye xezebê, hêrs bûye û tevi xezirana (darê zilek) destê xwe ji diwanê, ji ser kursiyê xwe rabû.

- Zû, bila vana bêne qirkirin û kuştı ji kujdaran ra bin! qiriya û bi ferma wi hemû Sekban û Sarîca wana (Kurdêñ dilkiri) kuştın. Her yek ji wan jar û perişan bûbû û çaxa ku ji mindalêñ xwe diqetiyen melûl melûl dîmariyan û her yek ji wan wek mihêñ li qenarê daleqandi, di destê quesab da bi hewar û fizar mirin. Wê derê bû wek mehserê. Wê hingê ji Rojigîyan mîrqaseki ji destê kujdar filiti, şûreki ragirt û heft kesan da ber şûran, wê derê tevi hev kîr û wê hingê Paşa:

- Nekujin, nekujin! got û mîrxasê feqir azad kîr, wi kîr eskerê Wanê. Piştre merivêñ dora Paşa û giregirêñ Wanê dengê şûran û wi hêwîrzê ditin, li ber ketin.

Hanhanka mîn got:- Geli umeta Mihemed, çavêñ Paşa ji meriveki li ricakaran digere, lê tu

kes ji we naçe û rica nake. Hûn nabinin ku bi fatiheki pênci-şest meriv ji bo mîn efû kîr, hûn nabinin ku iro sê roj e ev meydana han ji xwinê bûye gol. Kuro herin rica bikin! Axa-yêñ Paşa çûn xwe avêtin ser dest û piyê Paşa:

- Sultanê me, ferma padişahê me hate bi cih anin, yêñ ku ji ber şûr filitine azad bîke, gotten û rica kîrin. Rica wan hate qebûlkirin û pêncsed kesen mayin xîlas bûn. Û her weha di vi şerê da ji ali Xan 1065 kes şehid bûn, sal ji 1065 bû û evya rastîhatineke (tesaduf) bi xêr bû. Ji ali Paşa ji, nehsed (900) kes hatibû kuştin.

Her weha ji Xwedayê mezin va eyan e ku ev dînya û karxana han bi hêwîrize hatiye sazkirin û insan ji berê va hatine kuştın û qirkirin.

(Germame, cild IV, rûp: 232 - 235)

## PIŞTİ ŞER

Piştî şer em çûn temaşa kemingeñen Paşa û Xan. Em ecêbmayi man ku çawa eskerên me li ciheki weha kevir û asê, cendek li ser cendek qira wan anine, "İlahi qewet û quđret ê te ye. Zû bila ehlîn Bedlisê van cendekan veşerîn! Şehidîn me ji li ciheki hêsinahi veşerîn, bîrindarêñ me bîbin ba doktoran!" Her weha Paşa, temini kîr, hate konê xwe û meclisa şêwrê dani.

Dema ku ber konê Paşa ji merivan tiji bû, serdergevan hate pêşberi Wezir:

- Sultanê mîn, Begêñ Kurdistanê yêñ ku ne-hatibûn cîvina mezin, Begêñ Hizan, Karni, Zerbaki, Keşanê şandîne hawarê û daxwaziya hevidinê dîkîn, got.

- "Piştî ku Basra kambax bû." "Conega mir nir şikiya." "İş ketiye rê û êriş hatiye pûçkirin" dibêjin, feyda hatîna van xayînen gunehkar ji niha pêva çi heye? Bîla bîcîhimin herin, got.

Axayêñ Wanê di cih da:

- Hêvi û dexalet Wezirê mezin ê bi şan û şeref! Tu ji heqê vana derîyi! gotin û zarin bi wan ket.

Paşa:- Vana, Begêñ Padişah in di eyaleta me da, belki sedemeki wan ê nehatinê heye. Wa vana hatîne, lê wê halê me bi yêñ ku hawara wan nehatiye ra çawa be? Em ê bi wan ra çi

bıkın? Wê çaxê hûn bî riya hevditînê beyan bıkın, got.

Waniyan ji:- Em hêvidar in ku ew ji wek Xanê Bedlisê bela xwe bibinîn, gotin.

Ha me dit ku, ewil Begê Şirwanê hat. Bî dorê Begê Hizanê, Begê Karni, Begê Zerbaki û Begê Keşan hatin. Lê Begê Hizanê wek pelê payizê zer bûbû. Bî ricif hatin pêşberî Paşa û erdê maç kîrin, Paşa li rûyê wan neniherît û deqekî şunda: "Vana ci ne?" got.

- Sultanê mîn, evya Şirwani ye ku jê ra dîbêjîn kurê Tatar, got serdergevan û wan da naskırın. Piştre Paşa got:

- Ev Çi çelebiyê bî rû ye ku rûyê wi wek pûrtê diwanê ye.

- Lê ev ki ye?

Begê Karni ye?

- Kuro bêiman, tu ketibûyi kijan çali û te nehati? got û berê xwe da hemûyan.

Gava ku Axayê Erciş û Adilcewazê yên Wanê, "em ê van Began lı ku derê bıkın mîvan? Jî Begêne me ra hurmet bıkın", gotin. Begê Karni:

- Sultanê mîn, konê me û eskerên me hene, em ê herin konên xwe, got.

Paşa dî cih da: - Rakın van kafiran! got. Tu nabêji ku jî berê va temini hatubû kîrin. Dî cih da heft Beg û Axayen Wanê, wana girtin û di konên wan bî xwe da, bî zînciran qeyd û bend kîrin.

Wê hingê Mihemed Begê Melazgirê yê ku bî dû Xan ketibû, hat. Hespên wan westiyabûn, eskerên wi bêtaqet û bêmecal ketibûn. Gava ku Xan reviyabû, dî nava çiyayan da hesp, hêstir, barên gîran, kon û gelek tiştên din veşartibû, lê bî heftsed ker û dused hespên kehêl wan eşyayan anin lı ber konê Paşa danin. Jî çiya, newal û gazan heftsed fîrâren mîrxas ên destgîrêdayi anin, ku her yek jî wan bedêli keleki bûn, çavên wan bî rûndik, singêwan vekiri, axin û zare zara wan dîghişt esman. Serê piraniya wan kesan ket binê şûrê celadê bê wijdan.

Dema ku wext gîha nivro hemû çawişen alayê, serbaz û esker lı ber diwanâ Wezir civiyan û bando lê ket. Mîlet lı ser hev xurici û talanênu ku Begê Melazgirê jî meydana şer anibû, hate belavkîrin. Ewil sîsed kon lı ser-

baz û giregiran hate dabeşkîrin, dû ra Paşa, konê Xan ê nexşandi da Mihemed Begê Melazgirê ku bî buhayê xwe sih hezar quruş dikir. Hêstir û hesp, lı xaziyênu ku bê hesp mabûn hatin belavkîrin. Hemû alet û şûrê cebîlxaneyi, hezar û heftsed tîving jî bo xezina Padişah hate wergirtin û teslimê wezifedare cebîlxanê bûn.

Top û cebîlxanê dîn lı tetwanê, lı keştiyan hatin barkîrin û topê Adilcewazê berbi Adilcewazê, topê Wanê ji berbi Wanê hatin şandin. Jî bo bî karanina şewşeki pêwist, deh top lı ber kon hatin hiştin.

Piştre lı diwanâ mezîn heşt qor bando hatin lêxistin, hemû serbaz û axayê ocaxê lı mîlen rast û çep dest, destênu wan lı ser hev girêdayi ketin rîzê û wê hingê hemû çawişen alayê bi deveki: "Xeza te piroz be! Xwedê emrê dîrêj bîde Padişah!" gotin. Pişti duayan Yusuf Kethudayê Paşa hat û destê Paşa maç kîr.

Paşa, ewil kurkeki reş ê samûr lê kîr, bî ser da jî qeftaneke gîranbuha yê kember-dîrêj û bî zêr lê kîr. Piştre Paşa bî destê xwe çelenkeki (kumê madeni, yan ji kumê bî gewher) sêçetel kîr serê wi. Çawişen diwanê: "Qeftan û çelenk lı te piroz be!" gotin û lı çepika xîstin. Dî peyra lı gor protokolê wezirê hakîmê Hekkariyê Mele Mihemed, Begê Mehîdiyan, İbrahim Beg, Begê Piyaniş, Gazikiran, Bargîf, Erciş, Adilcewaz û Mûşê bî qeftan û çelenk hatin perûkîrin. Jî bo kesen ku nehatibûn hawarê û hevkîri bûn, tişteki nehat dayin.

Paşa, wek diyari, jî bo her keseki qestanek da Mihemed Begê Melazgirê ku jî eyaleta Erzuromê hatibû, Begê Xînis, Bayezit, Avanîn, Pasin, Tekman û Kûzûcanê û bî destê xwe çelenken kîr serê wan.

Begê Melazgirê got ku: "Wezirê mezîn, gerçi Evdal Xan çıl hezar pezîn mîn talan kîr û kambaxkîrina wilayeta mîn jî xwe ra kîr armanc, lê Xwedê te şaşîyan bîparêze ku te jî bo xatîrê mîn êriş bir ser Xan. Me jî bî kin û xerez, bî ordiya ra şûr weşand û heyfê stend. Jî niha pêva ez jî bo mirîna xwe xemgin nabim.

...Dî 27'ê Remezanê ya sala 1065 (31'ê Tirmehê, 1655) da, jî bo Bedlisê Xanekî nû hate tayinkîrin.

(Germame, cild IV, rûp: 236-239)

# PEYVÊN DÛHEV / 1

Dî nav zargotin û nîvisarêñ Kurdan da peyvên ku lî dû hev têñ pîr in. Dî bîwêjê da maneyêñ hînek ji wana nêziki hev in, lê pîrani cûda ne.

Ev cûre peyvên han gotin, qewimandin û salîxdanen eşkeretur û xurttir dîkin. Jî ber vê yekê Kurd dî qisedan û nîvisarêñ xwe da, pîr caran wana lî dû hev rêz dîkin. Bî vi kari folklor û çanda me xusûsiyetêñ taybeti peyda dîke.

Me vana ji nav zargotin, efrandinêñ kevn û nû derxist û pêşkêşı xwendevanan dîkin. Lî dîvê tu caran neyê birkîrin ku, mîrov vana dikare zêdetir bîke, yan ji ji ber xwe derxe û bî kar bine. Hînek ji vana hene ku lî seranseri Kurdistanê nayêñ bikaranin. Hînek jê dî zaravê Sorani da nêzikê van peyvan têñ xebitandinê. Hînek jê ji, tenê dî navçeyek Kurdistanê da têñ bikaranin.

Jî ber ku rûpelêñ ROJA NÛ dest nade em van peyvan dî nav hevokeki da hin eşkere nişan bîdin û lî ber çavêñ xwendevanan raxin, me tenê peyvan lî dû hev rêz kîr.

Berevkar: VAZGAL

## A

- Abûr û şeref
- Acîz û hizni
- Agah û xeber
- Agîr û alav
- Agîr û şemal
- Al û gewez
- Al û vêr
- Ap û birazi
- Aqîl û feraset
- Aqîl û his
- Aqîl û kemal
- Aqîl û merifet
- Aqîl û sewda
- Ar û heya
- Armanc û daxwaz
- Aşiq û maşûq
- Avâ û avayı
- Awîr û nezer
- Axîr û aqûbet
- Ax û dax
- Ax û gor
- Ax û ox
- Ax û keser
- Ax û qebîr

## B

- Ax û wax
- Ax û zar
- Ax û axaler
- Axîr û oxîr
- Ayîn û oyîn
- Azadi û serxwebûn
- Azet û ikram
- Azet û xîzmet
- Ba û babelisk
- Ba û bahoz
- Ba û baran
- Ba û boran
- Bac û xerac
- Bang û sela
- Bar û barxane
- Bar û piştî
- Bask û qanat
- Baş û qenc
- Bav û bapir
- Bav û bira
- Bav û kal
- Bax û bostan
- Bedew û cindi
- Bedew û hori
- Behs û xeber
- Bejn û bal
- Belengaz û geda
- Belengaz û nezan
- Bend û ta
- Ber û best
- Ber û belav
- Ber û pişt
- Berf û baran
- Beri û beristan
- Bertil û bac
- Bext û iqbal
- Bext û miraz
- Bext û text
- Bext û wijdan
- Bê qeyd û şert
- Bê rûmet û kiret
- Bê ser û ber
- Bêri û bêrivan
- Bêtur û çêtür
- Bê dar û ber
- Bî dil û can
- Bî xêr û şahi
- Bî his û zana
- Bibe û nebe
- Bike û bilezine
- Birc û qesr

- Birq û jan
- Bine û binemal
- Bırsı û tini
- Bışk û guli
- Bışk û kezi
- Bışk û tûncik
- Bihn û reng
- Bir û bawer
- Bir û ray
- Boxe û beran
- Boş û betal
- Bük û xesû
- Bük û zava
- Bûn û nebûn

## C

- Car û bar
- Cejn û yed
- Cerg û hinav
- Cerg û dil
- Cewr û cefa
- Cil û berg
- Ci û mekan
- Ci û mîqam
- Ci û nivin
- Ci û sitar
- Ciwan û cehêl
- Ciwan û çeleng
- Cot û cobar
- Cot û ga
- Curm û cewab

## Ç

- Çak û xirab
- Çav û dil
- Çav û rû
- Çek û Posat
- Çek û sileh
- Çeleng û sipehi
- Çep û rast
- Çeper û kozik
- Çil û qerqaş
- Çil û sıpi
- Çit û berçit
- Çiya û bani
- Çiya û deşt
- Çiya û zozan
- Çol û beyar
- Çol û deşt
- Çol û çolistan
- Çem û av

## D

- Dad û bêdad
- Dad û hewar
- Dam û dezge
- Dar û devi
- Dar û diri
- Daw û deling
- Dax û hesret
- Dehl û dan
- Dek û dibare
- Dek û dolav
- Delal û xwinşirin
- Dem û dewran
- Dem û dezge
- Dem û wade
- Deng û bas (behs)
- Deng û gazi
- Deng û seda
- Deng û sitran
- Der û cinar
- Der û deşt
- Der û devi
- Derb û agir
- Derd û derman
- Derd û bela
- Derd û dax
- Derd û kul
- Derd û eş
- Derew û bêbexti
- Dest û bask
- Dest û lep
- Dest û mil
- Dest û mist
- Dest û pençe
- Dest û pê
- Dest û tili
- Dest û tiving
- Destmal û gustil
- Dev û diran
- Dowa û daxwaz
- Dowa û doz
- Dawet û dilan
- Dawet û şahi
- Dewlet û mal
- Dewr û dem
- Dewr û dewran
- Dewr û zeman
- Deyn û bar
- Dezga û dikan
- Dêl û biji
- Dêw û cinawir
- Dijwari û tengasi

- Dijwar û xedar
- Dil û ceger
- Dil û gurçık
- Dil û hish
- Dil û hinav
- Dilovan û mihrivan
- Dîlxweş û kamiran
- Dîkan û bazar
- Dînya û alem
- Dil û gotin
- Dîrûv û grêdan
- Din û ayin
- Din û diyanet
- Din û evter
- Din û har
- Din û iman
- Diwan û diwanxane
- Diwan û civat
- Dotmam û pismam
- Dua û silav
- Dûr û dirêj
- Dûr û nêzik

## E

- Ecûc û mecûc
- Edeb û usûl
- Edeb û terbiye
- Egit û erfat
- Ehd û qîrar
- Em û ew
- Emir û mal
- Erd û ezman
- Ern û bihntengi
- Ern û xeyidin
- Erş û ezman
- Erş û elek
- Erş û kursi
- Erzan û talan
- Eskeri û siyasi
- Eşq û heyecan
- Eşq û muhbet
- Evd û beşer
- Evd û insan
- Ewled û tewled
- Eyb û ar
- Eziz û şirin
- El û eşir
- Eş û jan

*(Dumahik heye)*

# " WELATÊ MIN DI DILÊ MIN DA YE "/3

## IV

( Lı mala Reşo. Hevalên Kurd têr se-redanê. Sîlav dîdîn û rûdinê. Dîkevin xeberdanê)

SİNO- Van rojan meriv pîr te nabîne, Ferhad. xuya ye ku tişteki bî te bûye. (dikenin)

FERHAD- Herê.... lê, niha mekteb pîr wextê min distine.

SİNO- Mekteb.... hahaha xuya ye ku tişteki pîr ciddi ye, êvaran ji dixe-bite... bî yeka taybeti ra. Tê kengê nişani deyni? Ango qesda min, bî mektebê ra?

FERHAD- Yek tê. Ez vedikim.

SİNO- Belki mekteb e. (Dikene)

FERHAD- Merheba Ahmed! Were hundır! këfa te lî ci ye! Tişteki qewimiye?

AHMED- (Serê xwe dihejine) Tex-min bîke!

SİNO- Te jî birayê xwe name girtiye.

AHMED- Na, mixabın ku min tu xebereki jê negirtiye.

REŞO- Te û keçikeki hevdu ditiye. (Ahmed bî mana nanakırınê serê xwe dihejine)

FERHAD- Ev weha nabe... Te masê rûniştinê ne stendiye, ne wişa ?

AHMED- (Şabûyi) Belê, niha min stend. Ez wek penaber têm qebûlkirin. (Morê nişan dide)

HEMÛ- Piroz be! (Wi hemêz dîkin, piroz dîkin û hinek xeber dîdîn)

SİNO- Sihûda te hebûye!

FERHAD- Zeman çiqas zû derbas bû! Tenê 17 meh!

SİNO- Dî derheqa min da tişteki gotin?

AHMED- Na, lê tê bibini ew ê işê te ji sererast bibe. Na, hevalno, em ê stran-nan nebêjin? Kêfa min lî ci ye.

FERHAD- Herê, em ê bîsturên. (Radike sazê û lêdixe. Hemû bî hevra dîsturên û dilanê dîgrin.)

REŞO- Fermo fêki bixwin.

FERHAD- Çawa dîçe, Botan, te swê-diya xwe hinek din ji pêş va bir?

BOTAN- (Sêveki dixwe) Swêdi pîr, pîr dijwar e. Zimanê min li swêdi na-gere. Ez ê çawa zanibim ku sêv "än äpple" yan ji "ett äpple" ye. Min bîryar daye ku herduyan ji bêjim. Ez bawer im ev fikreke baş e. Dî her rewşî da yê baş ev e. (Hemû dikenin)

REŞO- Tê bibini ku, tê rasti keçike swêdi ya delal bêyi û her weha tê zû hini swêdi bîbi. Wê çaxê tê bîbi wek swêdiyeki berahin.

FERHAD- Evya ne tişteki şas e. Lî Swêd mîr û jîn alikariya hev dîkin. Lî vê derê rewş cuda ye. Tu carna dilsar i, Sino.

SİNO- Ez tênagihijim, çawa zilamek ji bo koletiya jînekê dikare daxwaz bîke!.

REŞO- Lî em mecbûr in hini şîklê jiyanâ Swêdiyan bîbin.. Nexwe ew ê gelek dijwari derêne pêsiya me. Divê em xwe amadeyi jiyanekê weha bîkin heta ku em bîzvirin welatê xwe.

FERHAD- Herê vegeerin.... Kurd têngirtin, kuştin û êşkencekirin... û ez li vê derê rûdînem... Ez gelek fikirim û niha min bîryara xwe daye. Ez difikirim ku vegeirim welat. (Hemû bi bêdengi li Ferhad dînihêrm) Ez ê ji bo mafê me têkoşin bîdim. (Hemû serê xwe dihejinin) Tişteki ku ez li vê derê bikim, tune.

AHMED- Lî Rojhilata Navin hevalen ku bikarîbin alikariya te bikin hene. Ji bo çündina te çi ji destê me hemûyan bê, em ê bikin.

(Hemû bi hevra distirêñ û li hev vedigerinin)

## SAETA AZADIYE

*Çûka ku bi serbilindi û azad difire  
di demek firê da radiweste û guhdari duke:  
Deng bi ku da diçê? Pê çi dibe?  
Hesreta wi dişibe çi, ku ew ji wek me ye,  
pişti fetisandina vi dengê, lê dengeke aşkera  
di binê kûraya esman da, li ser rûyê welat û  
deryayan.*

*Ji bo aşitiyê zengilê azadiyê lêdixe,  
hemû zordariyên ser me hildiweşine.  
Niha jiyan bi ser dukeve!  
Zengilê azadiyê me aş duke,  
dibe derbêñ nû ji bo me û hêviyek dagirti,  
pêşerojek û baweri.*

*Çûk diğihije hêlina xwe ya emin,  
li ser zinareki bîlind, ku çar ali dibine  
ku dikare çavnêriya ser û qrizêñ dinê bike.  
Gelê me gişt bi baweriyeki dimesin:  
Wê di nêz da saeta azadiyê lêxe  
û taliyê em ê bigihijin jiyaneki giranbuha.*

*Ji bo aşitiyê lêdixe zengilê azadiyê... (2 car)*

## V

LENA- İşev tu ji min ra bêdeng têyi xuyan. Qey tişteki qewimiye?

FERHAD- Na.

LENA- Belê, tu guhuriyi. Xuyaye ku tişteki heye.

FERHAD- Na (keçikê hemêz dîke). Ez ji te hez dîkim, Lena. Gelek hez dîkim.

LENA- Ez ji, ji te hez dîkim.

FERHAD- Oy, wext gelek dereng e! Min soz da ku zû herim mal.

LENA- Ma qey tu nikari quesaki weri hundir?

FERHAD- Nîzanum... hevaltiya me bî dê û bavê te ne xweş e.

LENA- Eşş, kes li malê tune işev. Were, em ê sandviçeki bixwin.

FERHAD- Baş e, ew çax ji bo demeki kurt. (muzik)

LENA- Em dî oda Yvonne da rûnêñ. Ji holê bîhna boyaxê tê. Bavê min bî karê boyaxê mijûl dibe.. Lembê vêxe, Ferhad! (Lembe tê vêxistin û nişkava rasti gelek merivêñ hippi dibin, ku yan li ser seri yan ji li ser pişte xwe avêtine. Dî nava wan da xwişka Lena ji heye.) Qey tu li malê yi! Û bî qasi ku ez dibinim mîvanen te yêñ xerib hene.

HEMÛ- (Bî dengeki bîlind) Hêêêêê....! (Lena, tênegihişti serê xwe dihejine.)

YVONNE- Belê, em hatin malê ji ber ku qursa "Serê xwe baştır bî kar bine" hatibû iptalkirin. Berpirsiyarê qursa me li seminera "ji bo wezna ruhi mana deng". Tu dibini ku em dijin.

LENA- Belê, ki wîsa nake ku!

(Hemû hevalen Yvonne distirêñ)

YVONNE- Te xorkeki sipehi ji xwe ra ditiye, Lena! Yeki nû ye hî?

LENA- Hişê xwe bide serê xwe!

YVONNE- Wek ku tu zani min wi berê neditiye. Ez bawer im ku tê wi bi min bîdi naskirin.

LENA- Xwişka mina din Yvonne. Ferhad.

YVONNE- Ez bî hevditina me kêfx-weş bûm. Vana ji hevalen min in.

HEMÛ- (Serê xwe xwar dîkin û sîlav dîdin) Hêêêêê....!

FERHAD- Eger ev tê mana sîlavkirinê, wê çaxê... merheba ji we hemûyan ra!

YVONNE- Hêra hûn çiqas dagirti ne! Kaseta min a nermkirinê bigrin û guhdari bikin, ku wê çaxê hûn ê xwe wek meriveki nû his bikin.

LENA- Na ne lazım e, jı bo fikrên te yên diniti spas dikim. Dı maleki da jı bo malbatê dineki bes e.

YVONNE- (Lı ciheki mızdanê xwe bı keys dike) Eger hûn bixwazin, sibê hûn dikarin bı me ra derên der. Keçikeke nû hatiye vira. Ew pîsporê pêmîzdanê ye. (Binê piyê xwe dijdine)

FERHAD- Ew ê jı bo ci baş be?

YVONNE- Belê, hergav ciheki meriv diêse û eger meriv yekê weha bistine, xwe wek mireki his dike.

FERHAD- Ez yekê weha hildibjêrim (tercih dikim). (Lena hemêz dike. Ew dı nava ciyê Yvonne da winda dibin.)

YVONNE- (Diqire) Hopp hopp hopp! hay jı xwe hebini! (Ferhad û Lena radibin piya)

LENA- Çi ye? Tu bê aqıl i!

YVONNE- Ciyan wek berê bı keys kın. (Lena û Ferhad alikariya hev dikin)

LENA- Weha baş e, xwişka min a delal?

YVONNE- Na, piçek ali çepê va. ha weha...na, na... bı ali çepê va min got. Baş e. Temam! Temam!

LENA- Ü çawa heri peşmûrdeya bajêr weha xwe rast kiriye û jı nişkava bûye meriveka tekûz?

YVONNE- lê her insan dizane ku ronahiya dînyayê, jı kijan ali va wan encamên lêgerinê nişan dide.

FERHAD- Him... belê, temam. Belê wisa ye.

LENA- Ü ci têkiliya wi bı ciyê te heye?

YVONNE- Çend nuqteyên tora meridiyenê siheta insan tehdit dike û li gor tiştê ku min fam kiriye divê ciyê min li ali rastê be...

LENA- Belê belê, tişteki xwarinê heye?

YVONNE- Xwarin?

LENA- Belê, belê. Xwarin. X-w-a-r-i-n. Belki te dı derheqa wi da tiştekibihistiyen? Goşt, fîringi, sandviç eger jı ali te va bêñ naskırın?

YVONNE- Nîha?

LENA- Belê. Nîha. Hanhanka.

YVONNE- Lî Lenaya delal, ez bawer im hûn ê dı vi saeta rojê da zîkê xwe tije nekin. Evya ne tişteki

qeþulkirinê ye. Mehandina hemû xwarinan...

LENA- Of, Xwedêyo! (Diçe û sandviç tine. Yvonne dest bı jîdandina piyekî dike.)

FERHAD- Êşa te heye?

YVONNE- Na. Min jı nişkava xwe westiyayı his kir û her weha xarına weha bı lez piri caran tesireki nebaş çedîke. (Lena tevi sandviçan tê hundır)

YVONNE- Tu, Lena, gere te bîdiya ku masajkareki çawa sipehi hatiye cihê karê me! Ew masajeki enerjiyê ya bê qusûr dike. Dı nava bist deqên pîr xweş da. (Dikeve xeyalan)

HEMÛ- (bı dengeke girani) Buri Jöfö tolleeee!

LENA- Heyf û mixabın ku tu neçûyi qursa xweşikbûnê. Te dikaribû wê bı kar bianiya û wi masajkarê sipehi bîquncarta.

YVONNE- Lî wek ku tu ji dizani ez cûm. Deh hefte. Wek ku tê zanin ji çavê te nareve, xwişka min a ji herkesi bêtir hezkiri. Tu dikari xwişkeke xweşiktir bini ber çavêñ xwe? (Bı çalimeke balkêş di ber Ferhad û hevalen xwe da derbas bû)

HEMÛ- Halilaleeee!

LENA- Were rûnê û jı xwe ra sandviçekê bixwe, Ferhad. (Axin dîkşine)

YVONNE- Aaaaaaaa!

FERHAD- Qey disa masajkar ket bira te?

YVONNE- Ez bêriya wi tiştê ebedi dikim ku ez li pêşberi wi bim.

HEMÛ- Alarinaseeee!

YVONNE- Ez li wi tiştê ebedi û xweş digerim.

HEMÛ- Xweeeeeeeeeeeş!

YVONNE- Ez bı tevayı li xwe û xweeeeeeee ya rast digerim!

HEMÛ- Lî xweeeeeeee. Bı tevayı li xwe û xweeeeeeee ya rast.

(Ferhad û Lena li hev dînihêrin, serê xwe dihejinin û diçin. Rengê salonê tê guhartin. Tari.)

*(Beşa dawi maye)*

# Dî şerê azadiyê da "DENG" eki nû



Dî meha Çileyê Pêşin sala 1989'an da kovara DENG dest bî weşana xwe kîr. Dî destpêkê da bareki gîran da ser milê xwe, ji bo parastuna mafê gelê Kurd, ji bo aşkerakırına zordesti û hovitiyê, ji bo mafê insani û demokrasi û hwd. singê xwe da ber tir û êrişen dewleta kolonyalist. Berpirsiyar û kedkarên kovara DENG bî hemû dek û dolavên dewleta Tîrk zanibûn û her wîsa pê zanibûn ku wê çi bê serê wan.

DENG, bî Tîrki û Kurdi dest bî weşanê kîr û dî her hejmari da zêdetir cih da zimanê Kurdi. Pirali, zordesti û barbariya ser gelê Kurd da xuyan. Aşkerakırına rûreşi û entrikayên ku li Kurdistanê tên leyistin, êşkence û terora ku li zindanan, gund û bajaran tên bikaranin, dezge û planên qirkirin û helandina gelê Kurd ji xwe ra kir babetên sereke. Disa pirali na sandına diroka Kurdistanê, maf û azadiya gelê Kurd ji xwe ra kîr armanc û di ber xwe da.

Kovara Deng, hêj dî destpêkê da rasti gelek astengi û tedayên dijmin hat. Hejmaren 1 û 2 dî cih da hatin berevkîrin û qedexekîrin. Pişti hejmara duduyan berpirsiyare kovarê Kamil ERMIŞ hate girtin. Hêj ewraqên hejmara ewil temam nebûbû, dî derheqa hejmara dudu yan da ji bîryara berevkîrinê hate dayin. Sawcixana DGM ya İstenbolê, ji bo ifade û teblixkirina bîryara berevkîrinê kovarê bangi Kamil Ermiş dike, hanhanka wi derdixin dadgehê û didin girtin.

Pişti girtina K. Ermiş, kovara Deng berpirsiyarekî nû Sedat KARAKAŞ tayin kîr. Sedat Karakaş, formalitên qanûni temam dike û vedigere buroyê. Dî vegerê da li ser rê, bî komploya polês xwediye kovarê Hikmet ÇETİN û Sedat Karakaş tên girtin.

Sedat Karakaş, hêj berya ku dest bî wezife û weşana kovarê bike hate girtin. Ev ji dîde xuyan ku, dewleta



dagîrker tu qanûn û huqûq nas nake û li gor kîfa xwe eşqiyyati dîke. Li hember kovar û rojnameyên pêşverû û bî taybeti ji li hember kovarên Kurdi her cûre xirabi bî kar tine.

Girtina xwediye kovarê ji hemûyan balkêşir e. Ew, ji bo formalitên qanûni ji polêşxanê vedigere û li ser rê diçe dikaneki. Dî wê dikanê da, hînek pirtûkên ku li ser navêni wi nehatine şandin, dixin stuyê wi û raste rast komployek digerin. Dî eslê xwe da nav û navnişana kesê ku pirtûk jê ra hatine şandin xuyaye, lê bî marifeta polês nav û navnişanê tê windakîrin. Her weha berpirsiyariya van pirtûkan bî zorê dixin stuyê Hikmet Çetin û Sedat Karakaş, wana dîgrin û xwediye pirtûkan ê esli ji berdiđin. Paşê ji postexanê tê pirsin û aşkera dibe ku, dî Sîbata 1990 i da ew kesê ku koli jê ra hatiye bî xwe kolîyê paşa vedigerine. Xuya dibe ku, polês listik dileyize û bî xwe komployan hazir dîke.

Bî kurti heta niha çar hejmaren DENG derketiye û her çar hejmara ji hatine berevkîrin û qedexekîrin. Hema bêje serê her hejmareki berpirsiyarek hatiye girtin. Bêguman hovitiyên dijmin ne tenê ev in. Her roj êriş li ser êrişê tê kîrin, buroya kovarê tê gerandin, berpirsiyar û kedkarên kovarê tên tehditkîrin. Berpirsiyarek buroya Diyarbekir ji hate girtin û buro hate belavkîrin. Xwendevanê kovarê ji, nesîbê xwe ji vê terorê dîgrin.

Gelê Kurd ji êrişen dewleta kolonyalist a Tîrk ra ne biyani ye. Ew, dî hemû deverên jiyanê da dijminê xwe baş nas dike. Her weha dek û dolav û terora dijmin wê nikaribe dengê DENG, dengê gelê Kurd bide birin!

# NEWROZA 1990 Ú ŞİYARIYA NETEWI



Diroka cejna Newrozê gelek kevn e. Bî hezaran sal e ku gelê Kurd û gelên heremê Newrozê bî şahiyeyeke xurt piroz kırine û heta iro jiyandine.

Newroz ne tenê roja şahi û kêtê ye, ew her wisa roja serhildan û têkoşinê ye ji. Ú ji bo gelê Kurd naveroka wê ya siyasi ji hemû xusûsiyetên din pêştir e.

Lî hember zulm û zordariya dijmîn, gelê Kurd dî vê rojê da bî gelek çalaki û xebatên héja lî Newrozê xwe-

karker, gundi, dikandar, sînetkar, jîn û zarok daktein kolanan û lî hember barbariya dijmîn seri hîldan. Nêzi hefteki derê dikanêن xwe girtin û tirseke mezîn kîrin dilê dijmîn. Dî wexteki kurt da şîklê têkoşina Nisêbin û Cizîre lî gelek bajarêñ Kurdistanê belav bû. Diyarbekir, Batman, Silopi, Qızıltepe, İdil, Mazıdaç, Dêrik, Siliva, Lice, Hêne ji rojekî derê dikanêن xwe girtin û zordariya dijmîn rûrêş kîrin.



di dertê, lî hember dijmîn nerazibûna xwe aşkera dîke. Dijmîn ji hisyari û xebata gelê Kurd pîr ditîrse û ji ber vê yekê dî meha Adarê da lî seranseri Kurdistanê tedbirîn eskeri digre. Bî hezaran esker û polêş lî gund û bajarêñ Kurdistanê bî cih dîke, lî ciya û gelîyan qereqol datine -ku pîr caran xwin dirijine- ji bo ku pêşî lî hisyârbûna gelê Kurd bigre, ağıre Newrozê nede vêxistin.

Bî Newroza isal ra hisyariyeke nediti dî nav gelê Kurd da peyda bû. Lî Nisêbinê, lî Cizîre bî hezaran

Rabûna gel hemû tedbir û êrişen dijmîn pûç kîr. Lî gelek ciyan ağıre Newrozê ji her sal bêtir hate geşkirin. Lî Diyarbekir, lî Iştenbolê bî cîvin û şevêñ mezîn Newroz hate pirozkîrin. Dî şeva Iştenbolê da stranbêjê navdar Şîrin ji besdar bû.

Lî dervayî welat ji ali komele û rêxistînen Kurdi gelek şev û şahiyêñ Newrozê hatin çekirin. Xasîma dî şevêñ Federasyona Komelêñ Karkerêñ Kurdistan-KOMKAR da gelek şevêñ mezîn û bî rêk û pêk hatin çekirin. Bî gîsti dî seranseri Ewrûpayê da nêzi 40 hezar kes di şahiyêñ Newrozê da besdar bûn.



BIHA: 10 Skr

*Lî Cizîre berxedana Kurdan. Gel bî dîruşmîn "Em Azadi Dixwazîn", "Biji KURDISTAN" meşîya.*